

Taybetmendiyên psîkolojîk ên faşîst

Taybetmendiyên psîkolojîk ên faşîst ne tenê di kesên ku xwe wekî radikal didin nasîn de hene, lê di heman demê de di gelek kes û koman de dixuyê ku nîrxek cuda diparêzin lê bi rengekî totalîter tevdiagerin. Ramanwerên ku li ser diyardeyên çandî yê cuda kûrtir lêkolîn kirin... **Abdullah Polat / R.8**



Kurdistan cennetê vilikan o

Her cografya goreyê xo taybetmendiyê ci estê û Kurdistan de zî şaristanan ra bigî qezayan, qezayan ra bigî dewan heta gomeyan miyanê xo de taybetmendiyê dewlemendan hewênênê. Gama ke merdim ewnîyeno xozaya Kurdistanî vano ke cennet no ware yo. Her herême bi xozaya xo merdimî... **Gulçin Adar / R.9**



xwebûn

7-13 HEZİRAN 2021 HEJMAR: 77 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

Qedexe bikin jî kurd dev ji zimanê xwe bernadin



Di demên dawîn de ji bo parastin û pêşvebirina zimanê kurdî xebatên girîng tên kirin. Ji bo kurdî bibe zimanê fermî û bi kurdî perwerdehi were dayîn kampanyaya îmzeyan hatiye destpêkirin û kampanya didome. Li aliyê din ji aliyê Tora Ziman û Çanda Kurdî ve li Cizîr, Wan û Amedê bernameya mîtingan hat amadekirin. Dewleta tirk li Cizîr û Wanê mîtingên ziman qedexe kir lê gel li dijî qedexeyê li kolanan bû... **R.3**

Kurdî ne dîrî operayê ye

Vê hefteyê hunermend Mizgîn Tahir bersiv da pirsên rojnemaya me. Tahir destnîşan kir ku stranên kurdî ne dîrî operayê ne, zarokên kurd zû hîni operayê dibin û wiha got: "Ez im a ku dibêje ew stranên kurdî ne dîrî operayê ne, ev îdia ya min e ku ez cudabûneke pir mezin di navbera opera û stranên kurdî de nabînim... **Hevpeyvîn Evîn Hesên / R.4**

Sindoqa Girtî; Motîfek Xurt e

Sindoqa Girtî, piştî Kirasê Teng(2007) û Destên Vala(2012) pirtûka sisêyan a Lorîn S. Dogan e. Her sê jî kurteçîrok in. Sindoqa Girtî din ava xwe de dibe çar beş/binbeş; êş, tenêti, çûyîn û wekî encam jî çî-roka dawîn e. Lorîn S. Dogan, di her binbeşa pirtûkê de, di her çîrokê de, derê çîrokê vedike xwendevan dixwe nava kurteçîrokê û di encama her kurteçîrokê de xwendevan bêyî hemdê xwe, xwe dixwe şûna lehen-gên wê. Di berhemenê edebî de heger nivîskar di kêlîka xwendinê de, bêyî haya xwendevan ew xistibe nava berhemenê û êdî xwendevan wekî lehengê wê berhemenê bêhnê lê çîkiyabe... **Sidar Jir / R.5**

Welat difiroşin û talan dikin

Operasyona dersînora ku ji aliyê dewleta tirk ve li Zap, Avaşîn û Metînayê hatiye destpêkirin dewam dike. Heta niha li herêma operasyonê herî kêr 47 gund hatine valakirin û hat gotin ku hinek gund firotine dewleta tirk. Li aliyê din dewleta tirk daristanên başûrê Kurdistanê talan dike û daran li wesayîtan bar dike û difiroşe... **R.6**

Axa Başûr bi îhaleyan tê firotin

Li herêma Behdînanê bi êrişkariya dewleta tirk ve girêdayî gelek bûyer diqewimin. Gelê herêmê li dijî van êrişan nerazîbûnên xwe tînin ziman. Di çarçoveya derfetên xwe de gel dixwaze pêşî li vê tevgera dagirkerî û talanê bîne. Lê sed mixabin ku ji aliyê hikûmeta herêma Kurdistanê ve tu gav an go bertekek ji bo van êrişan pêş nakeve. Bêguman ev êrişên dewleta tirk ne yekalî ne. Lewma mirov nikare van êrişan tenê di çarçoveya pevçûnên eskerî de bigire dest û binirxîne. Ji bo analîzkirin û nirxandina vê mijarê divê mirov berê xwe bide pêwendiyên PDK'ê ên bi dewleta tirk re. Ji ber ku di rêvebirîya PDK'ê de gelek kes hene ku ji nêz ve di nav hevkarîya dewleta tirk de ne û ev kes li herêmê jî berjewendiyên netewî zêdetir li gor berjewendiyên xwe yê şexsî tevdiagerin. Divê mirov wisa li mijarê binêre... **Felemez Ulug / R.6**



Di avahiya rûxiyayî ya darazê de lêgerîna edaletê

Li navçeya Pirsûs ya Rihayê ji malbata Şenyaşar 3 kes ji aliyê parazvanên parlamenterê AKP'ê û xizmên wî ve hatin kuştin. Malbata Şenyaşar çalakiya xwe ya edaletê didomîne. Ji bo 23 kujer bînan darizandin malbatê serî li dozgeriyê da lê daxwaza malbatê hat redkirin. Emîne Şenyaşar bi lorandinê bingeha avahiya edliyejê bi destên xwe kola.

Stuna Şaristanîyê: Hîyerarşî

Pergal li ser hîmê hîyerarşiyê avabûye. Belê ji destpêka şaristanîyê heyani roja îroyîn, cure bi cure pergala hatin avakirin. Ji civakên nêçîrvaniyê, gundewarî û bajarî heyanî modernîzma îroyîn, li gor şert û mercên zeman û zemînê heyî, bi amûr û alavên li ber destan sazî û dezgehên cuda avabûne. Dem, dezgeh, amûr, alav, rexistinên hevpar yê şaristanîyên berê û yê nû ji gelek hêlan ve ji hev cuda bin jî hebûna hîyerarşiyê navgîneke hevbeş e. Lê belê cure, hejmar û nave-roka hîyerarşiyê bi ajotina dem û zeman re veguheriye. Hîyerarşiya sermayedarî: zengînen xwedan pere... **Ehmed Pelda / R.7**

Rêbaza diya min

Her ku ez bi şev dereng vedigeriyam malê min didî hîna diya min şiyar e, derzî û ta di destê wê de ye. Ji min re digot ka kurê min çavê min baş nabîne ji min re ta bi derziyê veke. Piştî demeke dirêj min nas kir ku diya min ji bo çî wiha dikir. Ew rêbaza wê bû ji bo ku bizanibe gelo min tiştek vexwariye û ez serxweş im an ne serxweş im. Heke min karîba ta bi derziyê ve bikim wê gavê ez serkeftî ji azmûnê derdiketim. Heke min nikarîba ez ta bi derziyê ve bikim wê gavê nas dikir ku ez serxweş im. Îca gelfî hêjayan min xwest ku wê serpêhatiya hevalê xwe bi we re parve... **Dildarê Amedê / R.10**

Veng

Filmêk ê derhênerê yewnanî Theo Angelopoulos esto. Sehne meclîse de derbas beno. Meclîse ke mebûsî heme her game kenê qelebalix, meclîsê ke mebûsî her têdir danê pêro... Mebûsêk qeybî xeberdanî şino verê kursîya xeberdanî. Verê kursî de wo la xebêrî nêdano. 10 saniye, 20, nîm deqe... Mebûsê bîni dest bi hume gume kenê. 40 saniye, 50, deqe... Veng mebûsan ra beno berz. Îtiraz, veng vetiş, qelebalix, ê ke vanê de hadê... **Cemil Oguz / R.9**



Nola pirpinîkên xwe...

Sûcên wan, kurdbûyina wan bû. Nola pirpinîka xwe li rohnkahiyê bigirin, hatibûn xwe li vî beşê welatê xwe yê piçekî azad girtibûn. Paşê li xwe hay bûbûn ku ew rohnkahî dê wan bişewitîne... **Agît Yazar / R.12**

Biyaniyên li ser axa xwe

"Karwanek wa dîsa bi rê ket... Bûn wek koçeran û felaket... Xeml û xêza wan karwana reş in... Bi derd û kul li pey hev dimeşin... Penaber in penaber... Wek koçera der bi der... Welat welat digerin... Bûne wek teyrê bêper..." Ev hevokên ku li pêy hev rêz bûne rastiya kurdan vedibêjin. Ev stran cihê hezar gotin û nirxandinan digire. Ji dîroka kurdan tu carî penaberî û koçberî kêr nebûye. Şer,

pevçûn, xizani, ewlehî, biryarên siyasî dibin sedemên sereke yê koçberî û penaberiyê. Koçberbûna ji cihê lê ji dayik bû û ji koka xwe qutbûn e, birîna ku tu carî nayê dermankirin e. Çend nîfş biguherîn jî şopên wan birînan her tim zindî dimînin. Ya herî zehmet jî koçberiya li ser axa xwe ye. Kurdan li Kurdistanê konê koçberiyê vedan... Di her konê de serpêhatiyeke û dîrokek heye... **Leyla Ayaz / R.2**

Biyaniyên li ser axa xwe

Leyla Ayaz

“Karwanek wa dîsa bi rê ket... Bûn wek koçeran û felaket... Xeml û xêza wan karwana reş in... Bi derd û kul li pey hev dimeşin... Penaber in penaber... Wek koçeran der bi der... Welat welat digerin... Bûne wek teyrê bêper...” Ev hevokên ku li pêy hev rêz bûne rastiya kurdan vedibêjin. Ev stran cihê hezar gotin û nixandinan digire.

Ji dîroka kurdan tu carî penaberî û koçberî kêm nebûye. Şer, pevçûn, xizani, ewlehî, biryarên siyasî dibin sedemên sereke yê koçberî û penaberiyê. Koçberbûna ji cihê lê ji dayik bû û ji koka xwe qutbûye, ew birîn e ku tu carî nayê dermankirin. Çend nîfş biguherin jî şopên wan birînan her tim zindî dimînin.

Ya herî zehmet jî koçberiya li ser axa xwe ye... Di rêwitiya ku şev û roj didome de ne serma û ne jî germahî canê mirovan diêşîne. Êşa di dilê wan de wekî ba û bahozê li ser vê erdnîgariyê digere. Qêrîna jinan, hawara mêran, giriyê zarokan, lorika pîr û kalan di guhê bakurî, başûrî, rojhilatî û rojavaşîyan de deng vedaye... Qêrîna ku mirov kerr dike qêrîna koçberan a li ser axa xwe bû. Kurd li ser erdnîgariya xwe êdî biyanî bûn...

Wek bakuriyên li Mexmûrê, şengaliyên li Dihok, Amed û Mêrdînê, efrîniyên li Heseke... geveryên li Wanê, cizîriyên li Şîrnexê û şeniyan Sûrê yên li Amedê. Gundiyên ku di salên 90'î de bêwar û bêcihmayî... Kurdan li Kurdistanê konê koçberiyê vedan... Di her konekê de ku hat vedan, serpêhatiyek û dîrokek heye.

Lê belê serpêhatiyên kurdên ku berê xwe didin welatên cuda jî trajediyekê din e. Her çend statuya penaberiyê girtibin jî li bajarên bi şafat jî tîra xwe bi bêmerhametiyê re rûbirû dimînin. Li vir çerxa jiyane ya ji bo penaberan cuda ye. Ev çerx ji bo berjewendiyên dewletan dizivire. Penaberî her tim bûn amûrên bazar û şantajê yê dewletan.

Dema ku mirov mijara penaber û koçberiyê bi giştî digire dest jin di nav de winda dibin. Lê rastiyeke heye ku jin di koçberî û penaberiyê de komên herî



bi dezavantaj in. Rêwitiya penaberî û koçberiyê ya jinan bi serê xwe çirokeke dijwar e. Jin bécil, bêpêlav û bêtîşt bi lêz û bez ji malên xwe derketin, bi destê zarokên xwe girtin civaka lê mezinbûyî li pêy xwe hiştin û berê xwe dan pêşerojê nediyar. Rêwitiya ku bi rojan di nava tirs û fikaran de pêk hatibû tenê destpêk bû. Bi hezaran zarok û jin bi rojan tî û birçî man. Her wiha zarokên ku di rê de jiyana xwe ji dest dan, an jî winda bûn di dilê dayikan de wekî xem û kulekê man. Lê jin û dayik neçarbûn ku bi xemên xwe ji bo yê mayî li ser pêyan bimînin. Ji bo koçber û penaberan pêşerojê nediyar dest pê dikir.

Di nav vê jiyane de cihaneke cuda li pêşberî jinan e. Avahiyan ku di nav de dijî, tîkiliya cîrantiyê, danûstandin, ziman, çand, bawerî, xwarin û vexwarin û hwd. cuda ye. Bi cudabûnê re jin ji civakê izole dibe û tenemayîna wê pêş dikeve. Ligel bêcih û bêwermayîna li cihê ku bi cih bûne jî yekcar tune tî hesibandin. Ligel wê yekê jî jin hewl didin ku hinî wê jiyane bibin. Têkilîdanin, çar-

reserkirina pirsgrêkên debarê, xwe negihandina xizmetên tenduristiyê û perwerde bi xwe bandorê li derûniya jinan dike. Civaka ku bi polîtîkayên dewletê teşe digire, li hemberî koçber û penaberên jin jî bêtir bê însaf e.

Xanî, kargeh, kolan û bajarên ku ji koçber û penaberên jin re biyanî bû, bi bêînsafiya civakê û polîtîkayên dewletan êdî bêtir bê ewle bûn. Xizani, kedwarî, şidet, destdirêjî û kuştin li pêşberî jinan bû... Ji bo debarê di karên herî nebaş û giran de bi heqdesteke kêm xebat li wan hat ferzkirin. Jinên ku bi şidet û destdirêjiyê re rûbirû man bi tehdîta kuştinê hatin bédengkirin. Tora fihûşê ya ku li dora jinan kêmin daniyê jî bû sedema gelek xwekuştin û qetilkirina jinan. Ev mijarên ku me rêz kirin rastiyeke e û li pêşberî hemû penaber û koçberên jin ên cihanê ye.

Her wiha rastiyeke din jî heye, tu bikî nekî jî tu tu carî nabî wekî kesên xwechî yê wê derê. Her tim tu wek biyanî û kesên duyemîn tî dîtîn. Ev hewlwest û nêzikatî çend nîfş biguherin jî

wisa ye. Hem ji bo xwechîyan û hem jî ji bo penaber û koçberan.

Li tevahiya cihanê rewşa penaber û koçberên jin wisa ye. Jixwe li tevahiya cihanê jî sedî 48 jin û jî sedî 52 jî mîr penaber in. Ev tişt nîşan dide ku koçberî û penaberî mijara herî girîng e ku li pêşberî cihanê ye. Hejmara penaberan bi giştî gihastiye 272 milyon, van daneyan di Rapora Rêxistina Koçberiyê ya Navneteweyî (IOM) ya sala 2020'î de cih girtiye. Ji ber şer û pevçûn û xizaniyê, ji Sûriyeyê 6,6 milyon, li Venezuellayê, 3,6 milyon, ji Afganistanê 2,7 milyon, ji Başûrê Sudanê 2,3 milyon û ji Myanmarê jî milyon kes koçber bûne. Herî zêde jî ev koçber berê xwe didin Amerîka, Fransa, Îngilistan û Almaniyayê.

Penaberî û koçberiya ku bi darê zorê pêk tî, bi xwe re jî bazirganiya mirovan, mafyaya organa, tora fihûşê, tiryakê û hêza kar a erzan pêş dixê. Li vir bazara her kesî cuda ye û tenê yê mexdûr dibin jî yê ku bêcih û bêwar in.

Jinên xwedî hişmendî welateke azad e

Li gorî efsaneyê, komek jin hebûn li welatê Lîbyayê yan jî bakurê Afrîkayê hukim dikirin û yek ji wan taybetmendiyên wan ên herî girîng ew bû ku ew rolên siyasî û leşkerî digirtin, da ku jin û mîr Yemenê bi wekhevî û edalet bi rê ve bibin. Her wiha van jinan hinek kevnepoyên hişk dimeşandin ku aliyekî pêsîra xwe jêdikirin da ku davetîna kevanan hêsan bikin, di heman demê de ew li ser erdê yekem jin in ku li hespan siwar dibûn.

Der barê armanca damezrandina Rêxistina Neteweyî ya Amazonên

Lîbyayê de, seroka rêxistinê Xedîca Biskirî axivî û got ku wan ji bo guhertina nêrînan ku jinan biçûk dibinin ev nav hilbijartine.

Jinên azad tî mehkûmkirin

Biskirî di axaftina xwe de diyar kir ku fikrên mîr her dem şûrê tewanbariyê ye li hemberî jinên azad û ev tişt anî ziman: “Jinên azad, di civaka me ya Rohhilata Navîn de mehkûmkirî ne, ji ber vê yekê tiştê normal e ku neyînî were dîtîn. Her wiha dema me ev dirûşm bilind kir, me biryar da ku em ê

bibin jinên şerker li hemberî nezani, paşverûti û neheqiyê da ku em hêza jinan a erênî bidin xuyakirin û zîhniyeta mîr bidin guhertin.”

Di axaftina xwe de Biskirî destnîşan kir ku hinek jin jî hene zîhniyeta mîr hildigirin, fikrên ku ‘jinên bedew jinên bêhêz in’ ava dikin û got ku bi dirûşma ‘jinên xwedî hişmendî welatekî azad e’ derketine rê.

Piştgiyariya derûnî

Der barê tiştê herî girîng ku rêxistin dixwaze pêk bîne de Xedîca Biskirî wiha dibêje: “Yek ji wan xalên herî girîng ku rêxistin li ser dixebite ew e ku piştgiyariyê bide jinên rastî tundiye hatine û wan di warê aborî û siyasî de bi hêz bike û piştgiyariya jinên ku bi kesên ne ji Lîbyayê re zewicîne bike, ji ber ku her kom bindest e û ji ewlehiya hestiyarî û îstîrkarê bêpar e.”

Haya jinan ji mafên wan tune ye

Xedîca Biskirî girîngiya piştgiyariya de-

rûnî ji jinan re tîne ziman û dide zanîn ku ji ber vê yekê rêxistinê nivîsgeha piştgiyariya derûnî û piştgiyariya qanûnî ava kiriyê lê nebûna belavbûna çanda piştgiyariya derûnî di civaka Lîbyayê de karê rêxistinê sînorê dîke û wiha dibêje: “Tevî vê yekê em dozên baş digirin û em piştgiyariya qanûnî û derûnî bê pere didin” û wiha lê zêde kir “Piraniya wan jinan rewşa wan a aborî normal an jî nebaş e û piraniya wan hay ji mafên xwe tune ne. Di mijarên mîrasî de jî zanîna wan tune ye û ji ber vê yekê ew tî tacîzkirin û rastî zordariyê tîne. Em deriyên xwe ji wan re vedikin piştgiyariyê didin wan û pirsgrêkên wan dişopînin.”

Her wiha di dawiya axaftina xwe de, seroka Rêxistina Neteweyî ya Amazonên Lîbyayê, Xedîca Biskirî xwest ku dengê wan bigihîje hemû jinên cihanê û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Ji bo me, jin welat e. Em hêvî dikin ku xwe pêş ve bibin. Her wiha em li dijî çandên ku jinan marjînal dikin tîdîkoşin.” **TRABLUS**

Dilan Aydın

Bajar bi bajar bi te re me!

Bi hêvî û hewldana ji bo dîtina te çend roj in li bajarekî deryayî me. Derya şîn, dar kesk, gul û kulîlk geş in, li kolanên bajar û peravên deryayê. Baran bînavber dibare, di van rojên xatirxwestina biharê de... Kolanên bajar bi baranê paqij dibin her roj û her şev. Tu ha ku dibînî ewr giran bûne û baranê dest pê kiriyê, bi ser dar û kulîlkên ku hemû diwar û şaneşînan malan xemilandine. Ev bajar û dîmenên wê yê bêhejmar, te dibin berî sedsalan. Wekî ku duh, îro û sibê bi hev re zindî ne. Xwedî ruhekî cuda ye, bêserûber lê heta tu bibêjî zindî.

Ez li bajar dinêrim xweş û ronî lê tu di dorpêça nexweşiya vîrusê de girtî, tenê yî di nava çar dîwarên tarî de...Kolan bi deng, derya bi pêl û reng lê tu di qefesek ji hesin û betonan de asêmayî! Her ku li derve digirim, êşa dîwarên ku te û bi hezaran dîl girtine zêdetir hîs dikim... Her ku li xwezaya bêhempa dinêrim, te û bi hezaran kesên ji xwezayê, ji hebûna xwe bêparmayî dibînim. Tu rewş, tu tişt bi qasî vê li zora min naçe... Tu cezayê ji bo mirov, bi qasî dîrxistina ji xwezayê giran nayê ji min re.

Li heman bajarê me, nêzê te me lê dikim nakim ev nêzikahî nabe gihîştin. Çav; tîr nabin, dest nagihîjin û dil kêfxweş nabe lew tu; heta tu bibêjî ‘dîlgirtî’ yî. Heta tu bibêjî dîr û negihîştî yî. Tevî ku her bajarê tu lê dimînî nêzî xwe dibînim jî... Herêma bi herêma bajar bi bajar diçî tu ev çend sal in, sal bi sal, derbas dibe temen bi dîrbûna ji te... Sal bi sal sebr û aramî zêdetir û qewîntir dibe lê temen kêm dibe bi nebûna te! Wekî ku sedsal derbas bûbin... Wekî ku sedsal in rêwî bim ji bo te!

Bajarên tu li wan mayî nas û dost in, di bîra min de bîranînan qedîm çêkirine. Wekî te nêzî xwe dibînim wan bajarên... Wekî te ji wan hez dikim, bêriya wan dikim. Êlih, Sêwaz, Mêrdîn, Elbistan, Çewlik û niha jî Gebze! Çiya û xwezaya wan bajarên, şopên ‘çûyîyan’ di bîra min de hiştine. Tu diçî em dimîn, li dû te, tu dimînî em tîne her û her li dû te! Çi du-bendiyekê jandar e ev rêwîti. Sînorê jiyane yê ku mafê me ye, em bi îradeya xwe lê bijî bin pê kiriyê û her tişt ji hedê xwe derbas bûye êdî!

Rêwitiya jiyane ya bi nediyariyan derdikeve pêşîya me; bila ji bo te her bîdome heta ku bi saxî û silametî bi dawî bibe. Jiyana ku rêwîti bi xwe ye; ji bo we bû bedeleke giran. Rîyeke wisa ye ku tu dikî û nakî dawî lê nayê loma jî ev civak, ev welat û ev tîkoşîn, deyndarên we ne û divê tu carî we ji bîr nekin.

Dixwazim bi helbestekê xatir ji te bixwazim li vî bajarê ku lê, hem dîr û hem jî nêzî te me:

*Ji rengê biharê û pelên daran bipirsin
Çendî zor e ku tu li gel wan jî
Xwe dûrî wan hîs dikî
Ji çûkan, awazên teyrên cur be cur...
Ji dengê wan ê ku her sibeh
Me ji xewê ji xefletê şiyar dike!
Ji baranê bipirsin;
Çendî zor e ku tu nikarî mîna wê ya
dilê xwe bi dilopan birijîni...
Ji bayê bipirsin;
Çendî zehmet e ku tevî tu dixwazî jî
nikarî wekî wî bi azadî li her derê bigerî
û bigihîjî cihê tu dixwazî!
Ji birûskê bipirsin;
Çendî dijwar e ku tu, nikarî di ger-
dûnê de wekî wê werî bihîstin, bi teqîna
xwe olan bidî û bedengiya ku dijberî jiyane
ye, belav bikî!
Çi ne û kî ne li ber wan em?
Ji ku hatine, diçin li ku û dixwazim
biçin li ku?*



Pergala tecrîdê îşkence ye

Tirkiye hiqûqa navxweyî û hiqûqa navneteweyî bin pê dike û di polîtîkayên tecrîdê de îsrar dike. Parêzer Newroz Îyşal bertek nîşanî tecrîdê da û destnîşan kir ku pergala tecrîdê îzolasyonêke mezin a îşkenceyê ye û divê tecrîd were bidawîkirin

Navenda Nûçeyan

Girtiyên ji doza PKK û PAJK'ê ji bo tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan were rakirin û zextên li girtîgehên bi dawî bibin ji 27'ê mijdara 2020'î vir ve dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger kirin. Greva birçîbûnê di meha 7'emîn de dewam dike.

Ji bo tecrîda li ser Ocalan were rakirin heta niha gelek çalakî hatin lidarxistin û herî dawî bi pêşengiya Komeleya Hiqûqnasên Azadîxwaz (OHD) li dijî tecrîdê xebata îmzeyan hat destpêkirin û 768 parêzeran piştgirî dan kampanyayê. Têkildarî tecrîdê û kampanyaya îmzeyan parêzer Newroz Îyşal ji rojnameya me re axivî.

Îyşal bi bîr xist ku Ocalan 22 sal in bi tecrîdeke giran re rû bi rû ye û wiha got: "Her ku diçe pergala tecrîdê girantir dibe û ev pergaleke taybet ya îşkenceyê ye. Ocalan 22 sal in li girtîgeha Îmraliyê tena serê xwe dimîne, malbata xwe nabîne, mafê wî yê têkiliya bi derve re û mafê wî yê hevdîtina bi parêzeran re tê binpêkirin."

Pergala Îmraliyê dijîhiqûqî ye
Newroz Îyşal diyar kir ku demeke dirêj serlêdanên parêzeran ên ji bo hevdîtina bi Ocalan re bêbersiv dihatin hiştin, ji sala 2011'an heta sala 2019'an hîç hevdîtina parêzeran pêk nehat û wiha axivî: "Ev pergala hatiye avakirin li gor hiqûqa Tirkiyeyê jî li gor hiqûqa navneteweyî jî dijî mirovahiyê ye. Pergal bi xwe îzolasyonêke mezin a îşkenceyê ye."

Îyşal da zanîn ku armanca pergala tecrîdê ne hiqûqî ye armanca siyasî ye û wiha got: "Bi vê pergale dixwazin îradeya gel bişkinin. Gelê kurd Abdullah Ocalan wek rêberê xwe dibîne û Ocalan jî bi fikrê xwe dixwaze pirsgirêka gelê kurd li çar perçeyên Kurdistanê û li Rojhilata Navîn bi awayekî demokratîk çareser bike. Ji sala 1999'an vir ve dewlet dixwaze fikrê çareseriyê biterpisîne. Ji ber vê yekê armanca pergale di serî de siyasî ye."

Siyaseta şer û tecrîdê
Îyşal bal kişand ser polîtîkayên dewletê û got ku dewlet ji bo bandora Ocalan kêmtr bike her diçe tecrîdê girantir dike û wiha pê de çû: "Heke dewlet bixwaze şer kurtir bike pêşî tecrîda li ser Ocalan girantir dike an jî dema ku bixwaze di siyaseta xwe de guhertineke çêbibe di Îmraliyê de jî guhertinan pêk tîne. Mixabin ev 5-6 sal in şereke pir dijwar diqewime."

Îyşal destnîşan kir ku mafê hevdîtina miwekil û parêzer di hiqûqa Tirkiyeyê de bi awayekî berfireh hatiye bicihkirin û ev tişt anî ziman: "Parêzerek di navbera seatên mesaiyê de dikarin di rojekê de seatek hevdîtîne bikin, ji girtina Ocalan heya niha ev mafê wî yê hevdîtîne nehatiye bikaranîn. Dema me daxwaza hevdîtîne dikir bi hincetên ku keştî xirab e, kesek ku keştîyê bişuxilîne tune û hewa ji bo çûyîne guncav nîne nedihîştin em hevdîtinan pêk bînin. Li gor qanûnên Tirkiyeyê û qanûnên navneteweyî divê hevdîtina parêzeran û



Ocalan neyê astengkirin û demildest hevdîtin bi Ocalan re bê kirin."

Xebata parêzer û hiqûqnasan
Komeleya Hiqûqnasên Azadîxwaz ji bo hevdîtin bi Abdullah Ocalan re bê kirin xebata îmzeyan dan destpêkirin û 768 parêzer û hiqûqnasan îmze kirin. Newroz Îyşal der barê xebatê de ev tişt anî ziman: "Hewce ye ku kesên ji xwe re dibêjin hiqûqnas tecrîda li Îmraliyê qebûl nekin. Heya niha îtirazên ku hatin kirin bes nînin. Tenê mayîn, cezayên dîsîplîne, bi cezayên hevdîtîne û qeyidkirina hevdîtînen bi parêzeran re êdî li girtîgehên din jî tîr ferzkirin. Piştî van kiryanan sazî û komeleya gotin ev ji ku derket lê ev kirin bi salan e li Îmraliyê pêk tên. Xebata îmzeyan li ser vê rewşê hat kirin. Xebateke girîng e û sekna parêzeran nîşan dide. Em dizanin ku polîtîkayên li Îmraliyê tenê li Îmraliyê

namînin, ev tecrîd xwe di siyaseta Tirkiyê de jî di hiqûqê de jî xwe nîşan dide. Em hêvî dikin ku sazî, dezgeh, komele û hiqûqnas hesabîr nêzikê ve rewşê bibin."

Hewceyî bi hiqûqê heye
Îyşal di dawîya axaftina xwe de got ku Ocalan her çî qas aktorek siyasî be jî ew kesekî girtî ye û axaftina xwe wiha domand: "Hewce ye hiqûq li gor girtîbûna wî pêk were. Li gor hiqûqê hewce ye ku tu kes ne li gor reng, nijad, ne jî ji ber fikr û ramanên xwe yê siyasî kiryarên cuda nebînin. Ne tenê Ocalan kesên ku niha li girtîgeha Îmraliyê jî dimînin bi heman awayî di bin tecrîdê de ne. Mafê name şandin, kovar û rojname standina wî li gor hiqûqa Tirkiyeyê jî tê binpêkirin. Ev kiryar ne li gor hiqûqa Tirkiyeyê ne, dema ev didomin dibin perçeyêke ji pergala îşkenceyê."

Di meha gulanê de 25 jin hatin kuştin

Li Tirkiyeyê her roj jin tene kuştin û bi tundiya zilaman re rû bi rû dimîne. Hikûmet li şûna ku jinê biparêze, hewl dide ku kujer û êrişkaran biparêze. Hikûmeta ku qetilkirina jinan nabîne, pesnê kujeran dide. Li gorî agahiyên Wezîrê Karê Hundirin Suleyman Soyul di nava mehekê de ji sedî 26 kuştina jinê kêm bûye û tenê 25 jin hatine kuştin. Lê daneyên heyî jî rastiyek din tîne ziman. Li gorî dane û lêkolîna Jinnewsê, piştî betalkirina peymanê ji 20'ê adarê heta 20'ê gulanê 44 jin hatin kuştin. Di meha gulanê de jî 25 jin hatin kuştin. **AMED**

Pakêta darazê xapînok e

Serokomarê AKP'î Tayyîp Erdogan di 30'ê Gulana 2019'an de "Belgeya Stratejiya Reforma Darazê" aşkere kiribû. Di çarçoveya vê yekê de niqaşên 4'emîn Pakêta Darazê bi dawî bûn. Endamê Komîsyona Edaletê ya Meclîsê yê HDP'ê Mehmet Ruştu Tiryakî, bal kişand ser pakêta 4'emîn a darazê û wiha got: "Ev pakêtek xapînok e. Di pêvajoya ku têkiliyên dewlet-mafya-siyasetê tê niqaşkirin de, mirov nikare qala pakêta darazê bike. Ev pakêtkaweriyê nade tu kesî." **ENQERE**

Leşkeran trafo rakirin, li gundiyan dan

Li gundê Başîkê navçeya Şemrexê ya Mêrdînê, bi hinceta ku deynê wan heyê, Şirketa Belavkirina Ceyranê ya Dicleyê (DEDAŞ), trafoya cotkarên ku li dijî hişkesaliyê têdikoşin rakirin. Xebatkarên DEDAŞ'ê bi cendirmeyan re çûn gund û di navbera wan û cotkaran de niqaş derket. Cendirmeyan li cotkarên ku li dijî rakirina trafoyê derketin dan û wan ji trafoyan dûr xist. **MÊRDÎN**

Dê Mîhrîcana Feqiyê Teyran bê lidarxistin

Odeya Bazirganî û Senayiyê ya Amedê (DTO), Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçberiyê, Wêphotos, Navenda Hunerê ya Mordem, Atolye A4, Wêjehê Amed û Kolektîfa Hunerê ya Merkezkaçê li avahiya Navenda Hunerê ya Mordem a li navçeya Peyasê bi daxuyaniyêke çapemeniyê ragihandin ku wê di Nîsana 2022'yan de li Amedê Mîhrîcana Feqiyê Teyran ya Çand, Huner û Xwezayê ya Navnetewî li dar bixin. **AMED**

Girtî tazî kirin û av nedan wan

Nûner û rêveberên Baroya Wanê, OHD, TUHAY-DER, Odeya Tabîban, ÎHD û THÎV, li ser lêkolîn û ziyaretên girtî yê jin, rapora ku têkildarî rewşa Girtîgeha Tîpa T a Wanê amade kirin. Rêxistinên mafên mirovan li ser rewşa girtîgeha Tîpa T a Wanê rapor amade kir. Rêxistinên di raporê de diyar kirin ku rêveberiya Girtîgeha Tîpa T a Wanê di lêgerînan de zorê li jinan dike û ji wan dixwazin ku xwe tazî bikin. Saziyan di raporê de destnîşan kirin ku rêveberî zorê li girtîyan dike ku derbasî qoxûşên bêalî bibin, avê û doşekan nadin girtîyan." **WAN**

Mîtîngên ziman hatin astengkirin

Navenda Nûçeyan

Di demên dawîn de ji bo parastin û pêşvebirina zimanê kurdî xebatên girîng tên kirin. Li aliyekî platform û tor telen avakirin û li aliyê din jî kampanya û çalakiyên cur be cur tên lidarxistin.

Ji bo kurdî bibe zimanê fermî û bi kurdî perwerdehî were dayîn kampanyaya îmzeyan hatiye destpêkirin û kampanya didome. Li aliyê din jî aliyê Tora Ziman û Çanda Kurdî ve li Cizîr, Wan û Amedê bernameya mîtîngan hat amadekirin.

Beriya mîtîng bîr lidarxistin li

Amedê têkildarî mijarê daxuyanî hat dayîn. Hevseroka Komeleya Lêkolînên Çand û Zimanên Mezopotamyayê (MED-DER) Şîlan Elmas Kan diyar kir ku kampanyaya ku di 22'ê sibatê bi daxwaza "Bila zimanê kurdî bibe zimanê fermî û perwerdehiyê" dabûn destpêkirin hem online hem jî bi awayekî nivîskî berdewam dike.

Kan destnîşan kir ku kurd bi 9 partiyên xwe û bi hemû sazî û dezgehên xwe ve piştigiriya vê kampanyayê dikin û wiha berdewam kir: "Kurdan yekitiya xwe li ser ziman avakirine. Her çîqas astengî çêbibin jî dê kurd bi milyonan îmzeyên xwe berhev bikin û paşê serî li

hemû sazî û dezgehên Tirkiyê û cîhanê bidin. Ziman mafekî rewya ye û xeta sor a kurdan e.

Li Cizîrê piştî astengiyê daxuyanî
Mîtînga ku di 3'ê hezîranê de li Cizîrê were lidarxistin ji aliyê dewleta tirk ve hat astengkirin. Piştî astengkirina mîtîngê daxuyanî hat dayîn. Hevseroka DBP'ê Salîha Aydenîz û Berdevkê Platforma Zimanê Kurdî Şerexan Cizîrî, Serokê Giştî yê Partiya Komûnîst a Kurdistanê Sînan Çiftçuyrek, Parlamenterên HDP'ê yê Şîrnexê, rêvebirên HDP'ê DBP'ê yê Mêrdîn û Amedê, aktivîstên TJA'yê, rêvebirên

HDP'ê yê navend û navçeyan û gelek kes beşdarî daxuyaniyê bûn.

Jinan bi kincên xwe yê geleri reng dan şahiyê. Beriya daxuyaniyê, girse li hewşa avahiya navçeya HDP'ê govend gerand. Piştî daxuyanî hat dayîn û di daxuyaniyê de pankartên "Tundiya li ser ziman tundiya li ser jinê ye, tundiya li ser jinê tundiya li ser civakê ye" û "Bila zimanê kurdî li Tirkiyê bibe zimanê fermî û perwerdehiyê" hatin vekirin.

Şerexan Cizîrî û Sînan Çiftçuyrek axivî û bal kişandin ser girîngiya zimanê kurdî û xwestin zimanê kurdî bibe zimanê fermî. Di daxuyaniyê de Salîha Aydenîz û wiha got: "Zimanê me tecrîd kirine û heta ku zimanê me bibe zimanê fermî wê têkoşîna me bidome." Piştî heyet çû serdana esnafên Cizîrê.

Li Wanê qedexa û gengeşî
Li Wanê jî ji aliyê dewleta tirk ve mîtînga ziman ku di 4'ê hezîranê de bihata lidarxistin hat astengkirin. Polîsan Parka Musa Anter ku mîtîngê li bihata darxistin dorpêç kirin, girseya ku xwest bi sê milan biherikin qada mîtîngê ji aliyê polîsan ve hatin astengkirin. Di navbera parlamenterên HDP'ê û polîsan de niqaşên tund derketin û polîsan nehiştin rojnameger nûçeyê bişopînin.
Beriya ku rojnameya me biçe çapê hêj mîtînga li Amedê nehatibû lidarxistin.



ZAROKÊN ME ZÛ HÎNÎ OPERAYÊ DIBIN

Stranên kurdî ne dûrî operayê ne

■ Evîn Hesên

Mêvana me ya vê carê stranbêja operayê Mizgîn Tahir e, ji bo em agahiyên dawî der barê hunermenda xwe de bi heskiriyên wê û şopdarên muzîka kurdî re parve bikin, me ev sohbet bi Mizgîn Tahir re kir.

Çiroka te ya stranbêjiyê çawa dest pê kir?

Ji biçûkaniya min ve ez di nava rewşeke hunerî de bûm. Bavê min dengbêj, tembûrvan bû, jê re digotin Necîmê Tembûrvan. Birayê min Rezan Necîm Omerî mezinê malê bû li cumbişê û ûdê dixist. Xwişkê min distira, dengê wê pir xweş bû, metka min stranên gelerî digotin, ji lew re ez dibêjim tovên wan di min de hatin çandin. Ji bav, dêya min ku çirok di şevbihurkan de digot, di nava vê mijarê de rêya mirov a hunerê vedibe û baş vekirîye ku ez bibim guhekî muzîkjen. Ji ber vê yekê çiroka hunerê ji zarokatiyê ve bi min re çêbû, êdî ji wê hingê ve me di nava komên muzîkê de yên ji bo Newrozê dihatin amadekirin cihê xwe digirt. Yek ji wan jî Koma Ronahî ya Dirbêsiyê bû ku min li ser dikeya wê rolekê lîst. Têkildarî tovê bi min jî zaroktiyê ve dest pê dike. Der barê civakê de helbet astengî derdiketin. Ji ber ku li gorî civakê nabe ku keç derve derveyî bajarê xwe. Ê xwesteka min rê li pêşiya vê yekê digirt, ji ber ev rêya min bû û bawerîya min pê hebû ku ez ê bibim muzîkjen. Heta pileyên min ên xwendinê jî bi min re bû alîkar û rê li pêşiya min vekir ku ez herim Peymangeha bilind li Şamê bixwînim. Lê vê dawiyê min muzîk xwend, ji ber ez nehatim qebûl kirin. Lewra diviyabû beriya wê bi du salan amadekarî hebûya. Ji lewma min du salan arkolok li Şamê xwend û di nava van du salan de min amadekariyên xwe ji bo muzîkê kir da ku derbasî konservatuarê bibim û ez qebûl bûm.

Zêdetirî kesekî di malbata te de distirîn, çi qasî bandora wan li te hebû?

Di malbatê de birayê min Rezan, birayê min Şikrî, xwişka me Gulîstan bi strandinê re mijûl bûn. Min û Gulîstanê pir bi hev re kar kir di nava komên Newrozê de, carê ji min re digotin ka ji me re bistirê, min digot na ez ê tiştekî din bistirê. Min baş rêya xwe didît û min dixwest tiştekî cuda û akademîk bim, lê dîsa jî bandora wan li min pir hebû, şahî li dar dixistin, distiran, bi taybet bandora metka min li min hebû. Lê rêya wê demê tenê ew bû ku mirov cihê

xwe di nava komê de bigire. Ev nayê wê wateyê ku bandora wan li min tune bû, berovajî vê yekê bandoreke diyarker bû. Nexasim bandora metka min Hesna ku ji her du çavan kor bû, carê dihat cem me malê ji ber hevserê wê çûbû rehmê û pîrî caran li mala me dima, carê bi destên min digirt û digot were em bistirê. Kesê duyemîn ku bandor li min kir, bavê min bû, tembûra xwe radikir, lê dixist û îca hem em direqisîn û hem jî me stran li dû wî vedigerand, heta min pîrîniya stranên wî nivîsandin, lê mixabin li Serêkaniyê man.

Te kengî nas kir ku tu stranbêjê operayê yî û tu çawa tevgeriyayî, ji ber ku ev cure huner di civaka me de xerîb e?

Rast e, kesekî bîra vê yekê nabe, ku kurdekê here operayê bixwîne, lê min dixwest ez operayê bixwînim anku tiştekî akademîk be. Jixwe bi wan şevbuhêrkên dengbêjiyê, çirok û destanên ku digotin pir bala min dikîşand. Ji ber ku ji min re xerîb dihat, yanî ev cure stran ne wekî yên din e; çirok in lê bi stran tîn gotin, bi karakter in. Gava ku ji min re digotin were bistirê min digot na ez ê tiştekî cuda bikim, ew bîrbûna tiştekî cihêwaz tim li cem min hebû. Min dixwest ez noutayan bizanibim, carê di TV'yan de derdiketin û bala min dikîşand. Carê dêya min bang li min dikir û digot, were va ew jî wekî te dikin qîjewî. Li vir min dixwest ew destan ew çirok bikeve nava rewşeke cuda, vê dawiyê ez li ser vê bawerîya xwe ya ku ev huner nêzî opera ye westiyam û min kar kir. Di nava miletan de tiştekî wekî destanê zindî tune ye, tenê miletê kurd heye. Ez im a xwedî îdîa ku dibêjim opera ji destanê hatiye çêkirin. Miletê Ewropayê pir hatin û tiştên hunerê ji Rojhilata Navîn birin, yek ji wan jî ev cureyê hunerê ye. Ji ber ku, bi min ev cureyê hunerê ye, destan heta niha zindî ye û di nava miletan de tiştekî wiha tune ye. Ji Gilgamêş bigire û heta bi Memê Alan, lê mixabin heta niha me wekî muzîkjenên kurd kar û xebat nekir û me nekir karên xwe ku em van cureyên hunerê derxin holê û bibêjin ev cure ya me ye û ne ya tu kesî ye.

Tu kurdî û tu li peymangeheke erebî fêrî muzîkê bûyî yan jî fêrî stranbêjiya bi terza ewropî, operayê bûyî, tu dikarî vê ji me re şirove bikî?

Gava min xwest ez operayê bixwînim min biryareke tund da, ji ber ku civakê ev biryar nedida. Lewra min da bala xwe ku ez rêya xwe binexşînim, ez neçûm ku konservatuarê

Niha ez hatime Rojava û min xwest ez karê li Bakur tamam nebûye li vir tamam bikim, tiştekî ji miletê xwe re bikim, niha xebata orkestraya zarokan bi rê ve dibim, zarok zû bi zû fêr dibin; tu dibêjî qey toveke û tu diavêjî erdê hema wisa digihêjin

areke erebî bixwînim na. Ez çûm ku Memê Alan çawa bikim opera, çawa destaneke kurdî bikim opera. Tenê di nava muzîkalên erebî de mala Rehebanî bala min kişand, ji ber ku xwestin tiştekî cuda bikin û westiyam. Di encamê de çûm akademîyê bixwînim, ez ê fêrî harmoniyê bibim, her wiha ez ê fêrî belavbûnê bibim, bikim karê xwe ku civaka xwe pêş bixim û bi çavêkî din li destanê binêrim.

Tu wekî kurdekê û hunermendeke di dema xwendinê de, pirsgirêkên ku tu pê re rû bi rû dimayî çi bûn?

Helbet gava tu tiştekî nû bixwîni tu yê bi pirsgirêkan re rû bi rû bimîni. Ji ber ku tu keçek î û tu dixwazî herî hunerê bixwîni... Ev di nava civakê de zehmet bû, ez keçika bi tenê bûm ku li bazarê, bi birayê xwe re, li navçeya Dirbêsiyê kar dikir. Hinek pirsgirêkên wiha yên di nava civakê de min bi xwe û mala xwe re çareser kiribûn ku dikarim kar bikim. Paşê çûm Serêkaniyê jî bi birayê xwe re li ber fotografaneyê bûm. Heta hin kesan digotin ma qey kurê Necîmo tune ne ku keça xwe dişîne da ku li dikanê bixebite. Lê bavê min bersiveke xurt dida wan û digot, Mizgîn bi sed mêrî ye. Ji ber vê yekê kesî nikaribû pirsgirêkên wiha derxista. Heta bêbextî jî dikirin û ewlekariya wê demê jî nedihîşt ku jinek vî karî bike. Dû re çûm Şamê, tevî ku digotin em ê te bişînin Rûsyayê, beşa dermansaziyê li cem birê xwe bixwîne, yan jî biçe Heskê û bibe mamoste. Lê min ev tevde derbas kirin û xwişka min Şikriya ku ji bo min wekî dayikekê bû gelekî piştgiriya min kir û hişt ku ez wê qonaxê derbas bikim. A din jî di nava konservatuarê de jî pirsgirêk derdiketin. Mesela digotin ev kurd e hay jê hebin. Tevî ku ez ji kesên jêhatî jî bûm, wan hevalên min ên ji min pir qelstir xistin nav kar lê wan ez nedixistim nav kar. Dema Serhildana Qamişlo ya 12'ê Adarê çêbû digotin hûn Kurdistanê dixwazin, tu jî kurd e û min ji xwe xerîb dihesibandin, derfet didan Ereban. Wê demê ez ji kesên yekem bûm ku min cihê xwe di nav wan de digirt û çaxê kom ji derve dihatin, dengê min diçibandin û digotin: "Ka were bi me re" lê rêveberiyê nedihîşt.

Tu strana kelepûrî ya kurdî û op-**eraya têkelî hev dikî, heta kîjan astê cemawer vê yekê dipejirînin?**

Stranbêjiya kurdî û opera bi rastî hinekî ji hev cuda ye, wekî rêbaz wekî pozîzyonên qirik, lê teknîka nefesê heman teknîk e. Dema ku tu straneke kurdî dibêjî bi dengê perwerdekirî, bi perwerdeya dibistana operayê hinekî cuda dibe. Lê ez bi kar nayim û dibêjim pêwîst nake, sedema ku ez vê bikim tune ye, opera cudahiya hîs, karakter û taybetmendiyên e, divê mirov dengên baş derxe, lewma ez vê yekê nakim, ger opera bibêjim bi kar tînim, lê ji bo straneke kurdî nabêjim tenê nefesa xwe ya kurdî didim der.

Hin kes dibêjin stranên kurdî yên berê nedûrî awayê operayê ne, mî-naka wê jî stranên hunermend Şakiro ye heta yên Kawîs Axa ye jî, tu ji bo vê çi dibêjî?

Ez im a ku dibêje ew stranên kurdî nedûrî opera ne, ev îdîa ya min e ku cudabûneke pir mezin di navbera opera û stranên kurdî de nabînim. Ji Gilgamêş bigire û heta niha ew destan hîn li cem me berde-wam e û hunermendên me distirên, ez dibêjim ev cureyê hunerê ji Rojhilata Navîn û cem kurdan hatiye birin, xebitandin û bûye opera.


Tu çend salan li bakurê Kurdistanê mayî û niha jî tu li Rojava yî, te çi ji vê rêwîtiya xwe wergirt?

Bi xwedê ez dora deh salan li bakurê Kurdistanê mam, di neqeba Amed û Batmanê de dixebitîm hem li

akademiya Cegerxwîn mamostetî dikir, hem jî mamosteya deng bûm. Heta demekê jî mamosteya muzîkê bûm, li Batmanê jî mamosteya Heskîfê bûm. Lê dîsa jî ez bi astengiyên dewletê û astengiyên ku di nava me de jî çêdibûn, rû bi rû dimam. Êdî li vir lêkirina dengên ji bo me bingeh bû, me projeyê baş da meşandin, bû sedem ku orkestraya kurdî çêbibe û xewna xwe bibînim. Dema me dest bi destana Keybano kir ew gava yekem bû, min ew nivîsand û Mehmûd Berazî jî muzîk danî, ya din ku dixwazim balê bibim ser ew e ku me xwe spart stranên kevn, ji ber ku me xwest em di nava xwe de li xwe bigerin, lê mixabin ew orkestra hate sekinandin hem dewletê derfet nedida û hem jî kêmasiyên me hebû. Cardin hêviyên min hene ku ew ê projeyên baştir derkevin holê.

Projeyên we yên nû çi ne?

Niha ez hatime Rojava û min xwest ez karê li Bakur tamam nebûye li vir tamam bikim, tiştekî ji miletê xwe re bikim. Niha xebata orkestraya zarokan bi rê ve dibim, zarok zû bi zû fêr dibin; tu dibêjî qey toveke û tu diavêjî erdê hema wisa digihêjin. Wekî din jî muzîka rêzefilimê bi rê ve dibim, di nav re jî hinek stranên xwe amade dikim ku tomar bikim. Bi rastî ez pir dixwazim orkestrayê baş û bitevdîr li Rojava jî çêbibe. Lewma jî hewldanên me hene ku orkestraya mezinan jî çêbikim. Di dawiyê de ez pir û pir dixwazim serê xwe bi welatê re xwe re biêşînim.



Mizgîn Tahir kî ye?

Mizgîn Tahir a ku wekî yekemîn soprano ya kurdî tê nasîn di sala 1976'an de li rojavayê Kurdistanê, li bajarê Dirbêsiyê hatiye dinyayê. Bavê wê dengbêj Necîmê Omerî an Necîmê Tembûrvan bû û birayê wê, xwişka wê stranbêj bûn. Lê Mizgînê dixwest muzîkeke ji wan cudatir çêbike. Di 1999'an de dest bi konservatuarê kir û xwendina xwe di Amûjgeha Muzîkê ya Bilind de dewam kir, di sala 2004'an de xwendina xwe li Şamê bi dawî kir.

Bê westan li ser şaşiyên bikaranîna ziman



Yaşar Eroglu

Hin şaşiyên bikaranîna ziman hene em weke rastî dizanin lê hin şaşî jî hene, bi arastekirina kes an sazî û derdorên ziman weke rastî tîn zanîn. Ez ê di vê nivîsara xwe de bikaranîna li ser çend peyv an tîgehên bisekinim. Ên a niha bala min dikişînin ser xwe ev in: “Vebêjer, guhdarvan, felsefevan, xwendevan, di derheqa, di derbarê, him, perçe, kê m bejî rabêjer.”

Ev reng bikaranîna çewt tenê bi axaftinên rojane, televizyonan ne sinorkirî ne. Gelek kovar, rojname, derdorên ziman ên bijarte weke akademîsyen, zimanzan û hwd. di nav van şaşyan de ne. Ya xerîb jî ev e û weke rastî bikaranîna wan berdewam e.

Car carinan ez li ser hin cure bikaranîna şaş disekim. Ev jî ber çî şaş in, bi mesnet û palpişt diyar dikim. Ez ê di vê nivîsarê de jî careke din bi heman rêbazê bê westan derpêş bikim. Ji bo rûniştandina zimanekî rast û teqez ê nivîskî weke peyvir dibînim.

Di van salên dawîn de weke teqînêkê li ser pirtûk, kovar û rojnameyan peyvên **di derbarê, di derheqa** belav bûn. Ji nişkê ve pêk nehat lê ji berê zêdetir berbelav e. Bikaranîna bi vî rengî şaş e, ji derveyî teşeyê kurmançî ye. Wateya van her du qaliban jî **heqê tiştêkî de, mewzûya tiştêkî de** di-hewîne. Di rastiyê de **di û der** hemwate ne û bi hev re nayên bikaranîn. **Der** farisî **di** kurmançî ye. **Der** daçekeke farisî ye, bi texmîna min jî ber tîkîlî û nêzikaya her du zimanan di kurmançî de kê m maye û em herî zêde van her du mî-nakan dibînin. **Derbar** di farisî de heye, weke çalak tê bikaranîn. Lê di farisî de wiha ye **derbareyî** ... wiha nayê bikaranîn; **der derbare+yi**. Daçekên farisî ev in; **ez=ji, der= di, be=bi**. Gava ku farisî dibêjin **di mal de** wiha bi kar tînin; **der xane**. Baş xuya dibe ku **der** a di **der-**

heq û derbarê de derbas dibe ji farisî ketiyê kurmançî yan jî tê de maye.

Em vegerin li ser çîroka **di derbar û di derheq**. Gava ew ê ku weke **di derbarê** yan **di derheqê** bi kar tînin ji eslê xwe wiha dirûv lê didin; **di di barê...**, **di di heqê** ... Ku em binivîsin; **di derbarê wêjeya kurdî de gelek lêkolîn hatine kirin**, di rastiyê de em dibêjin, **di di barê wêjeya kurdî de gelek lêkolîn hatine kirin**; bi rastî nayê tîgehîştin lê kurmançiyê terzankî derdikeve holê. Aliyekî wê yê din jî heye ku **derbar, derheq** pevre nayên nivîsandin, weke **der barê, der heqê** tîn nivîsandin. Mixabin an em mantiq û ruhê zimanê xwe ji bîr dikin an jî di bin bandora perwerde û zimanên biyanî de nas nakin/jê dixalifin. Ev meseleya **di derbar û di derheq** jî çawalêhatoyêke bi vî rengî ye.

Eger hin kes hê qanî nebin, hingê bila rastiya awayê rastnivîsandina xwe îspat bikin, her kesî bi teşeyê xwe bidin qanîkirin.

Di qada bikaranîna rêziman û rasnivîsê de berbelayî û bêberpîrsiyartiyek heye. Di serî de yê zanyariya ziman re eleqeder dibin di vê xemsariyê de ne. Ya rast bandora zimanê tirkî û zimanên biyanî jî heye. Di qada wêje, çand û ziman de gelek xebatên heja pêk hatine. Li gorî wê jî termînolojiyêke nû jî hewce tê dîtin. Gelek normal û pêdiviya çand, ziman û wêjeyê pê heye. Lê carinan termînolojî tê çêkirin reh, rîşî, rê û rêzikên ziman tîn jibîrkirin weke ku çawalêhato lê diqelîbin. Va ye çend mînak, ne ji nivîskar û wêjenivîsên em her dizanin, gelek akademîsyen, zanyar jî dikevin navê şaşiyê. Ez ê bal bikişînim ser tîgehê vebêjer, **felsefevan**, kê m be jî **rabêjer, peyva guhdarvan û xwendevan**. Tîgehê vebêj û rabêj li cihê discourses îngilîzî car carinan cih diguherîne û tê bikaranîn. Gava van tîgehên bi awayê takekesî bi kar tînin dibêjin vebêjer, kê m caran jî rabêjer. Tê fêmkirin ku qala vegotinê tê kirin lê gava dibe takekesî pîrs-girêk derdikeve.

Vebêjer û rabêjer di dewsa (*anlatan, anlatici, soylevciya*) tirkî de tê

bikaranîn. Li vir şaşiyêke rêzimanî heye. **Vebêj** jixwe wateya *anlatan* dide. Paşgira er takekesî bi awayekî ne di cih de dubare dike. Weke ku *anlatan*. Her wiha **rabêj** jî mîna wê şaş e. Em nabêjin dengbêjer, çîrokbêjer, sitiranbêjer û hwd. Takekesî an jî mûşahasa wan *bêj e*, ne *vebêjer* an *bêjer*.

Dîsa di qada zanyariyê de tîgehê **felsefevan** tê bikaranîn, ez ne şaş bim navê kovareke hatiye weşandin/tê weşandin jî **Felsefevan** e/bûye û bi heman navî malpera wan jî heye. Gelo beriya derxistinê li ser vî navî nîqaş kirine, bi min eger bikirana ev nav lê nedikirin, navekî zanistî û li mantiqê kurmançî nîne. Helbet ez ê egera wê diyar bikim.

Ez gelek caran li ser paşgira **‘van’** ê rawestiyabûm. Kiryarên pişeyî, zanîn, pîsporî, kûraya tecrubeyê dixwaze û hwd bi paşgira **‘van’** ê nayên navlêkirin. Paşgira **‘van’** zêdetir ji kiryarên parastin, lîxwedîderketin, payîn û yê jî rêzê ku pêçiriyeke bilind hewce nakin ve navdêr tîn çêkirin. Felsefe kaniya hemû zanistan e, kûrayî, zanîn û pîsporiyê ne jî rêzê dixwaze. Lê belê navlêkirina **felsefevan** (gelo wateya filozof de hatiye bikaranîn?) ji naveroka felsefeyê dûrketiyê, gelek sivik maye. Di cihê wê de tîgehê feylozof/filozof, felsefenas, felsefezan, felsefegêr dikare bê bikaranîn û baş li mantiqê û avaniya kurmançî jî tê.

Peyva **guhdarvan** dariştî yanî çêkiriye. Ji kîteyên **guh+dar+van** pêk tê. **Guhdar** kesê ku guhê xwe dide dengê yan jî hêmayêke weke deng. Ji **guhdarvan** jî mebest heman tişt nîn e? Erê wisa ye. Awayê guhdar rast e, li gorî mantiq û ahenga ziman e. Lê guhdarvan jî van rastiyan dîr e. Bêyî mantiqê ziman, bêyî zanîn û lêqelîbandî hatiye çêkirin. Peyva çêkirî xwendevan jî wisa ye.

Xwende+van pêk tê. Xwende kesê xwendî, xwîner e jixwe, ne hewceyî bi **‘van’** êkî heye. Weke guhdarvan dîrî mantiqa ziman e, bêyî mantiqa ziman, bêyî zanîn tê bikaranîn. Di vir de jî paşgira takekesî du caran û bi heman

wateyê tîn bikaranîn. Ziman ahenga xwe winda dike, deng guhên mirov diherişîne.

Gelek balkêş e pîrî caran di zimanê nivîsê de di cihê **hem de him**, di cihê **parçe de perçe** tê nivîsandin. Em jê haydar dibin tu dibêjî **hem û parçe** bi zimanê tirkî ne, bikarhêner dixwaze ji tirkî bireve, van peyvên weke **him û perçe** nişan dide, dixwaze li denge kurdî bîne. Di vir de ez psikolojiya parastina kurdî dibînim, weke reftarekê bi nîrx e. Lê fikra ku ew tirkî ne, ne rast e. Divê baş bê zanîn ku peyvên **hem, parçe, her, hiç, eger, çûnkî** û birek peyvên wiha bi kurdî ne, di farisî de jî hene, bi riya farisî û kurdî ketine zimanê tirkî lê em vî yekê nizanin weke peyvên resen ên tirkî dizanin, awayên wan ên rast şaş bi kar tînin.

Peyva **hem** kurdî ye hem jî hema bêjin di hemû zaravayên kurdî de heye. Em di jiyandê de her roj bi dehan caran bi kar tînin lê dema em dinivîsin şika tirkîbûne dikeve nava me û em beralî dikin.

Her wisa **parçe** jî kurdî ye. Koka **parçe** xwe dispêre **par** ê. Em nabêjin **pera** (hise) *min bide*, em dibêjin, *para min bide*. **Par+çe=parçe**. Piştrast dibe ku parçe ye, ne perçe ye û kurdî ye. Wateya **parçe** ev e; beşek ji **par** ê. Em yekûnekî weke par bihesibînin, ji wê yekûnê parek. Mîna, Kurdistan yekûn e, tam e lê bûye çar parçe. Em jî her beşekê re ku di bin desthilatdariya dewletekê de ye, dibêjin parçeyê bakur, başûr, rojhelat, rojava. Zebeşekî dikin du felqan her yek parçeyek e. Li gel ew qas îspata em çima dibin xerîbê zimanê xwe, li reseniya wî xwedî dernakevin? Ev jî ecêbeke din e.

Divê kurdên ku ziman, rêziman, rastnivîs û nivîsê re haşir û neşir in, di navdanûstandinê de ne, nemaze jî ew berî her tiştî mantiq û diyalektîka kurdî baş bişopînin, di nivîsandin û bikaranîna xwe de, li gorî vî rastiya tevbigerin. Her kes mintîqa xwe paqij bike, bala xwe bide ser vî yekê qet nebe ji aliyê xwe ve wê zimanê xwe xurtir bike, bigihîne merheleyêke bikêşmêş.



Sîdar Jîr

Sindoqa Girtî; Motîfeke xurt e

Sindoqa Girtî, piştî *Kirasê Teng* (2007) û *Destên Vala* (2012) pirtûka sisêyan a Lorîn S. Dogan e. Her sê jî kurteçîrok in. **Sindoqa Girtî** di nava xwe de dibe çar beş/binbeş; *êş, tenêti, çûyîn û wekî encam jî çîroka dawîn e*.

Lorîn S. Dogan, di her binbeşa pirtûkê de, di her çîrokê de, deriyê çîrokê vedike, xwendevan dixwe nava kurteçîrokê û di encama her kurteçîrokê de xwendevan bêyî hemdê xwe, xwe dixwe şûna lehengên wê.

Di berhemên edebî de heger nivîskar di kîlîka xwendinê de, bêyî haya xwendevan ew xistibe nava berhemê û edî xwendevan wekî lehengê wê berhemê bêhn lê çikiyabe, xwêdan dabe, xwîn lê germ bûbe, keniya be, xemgîn bûbe yan tirsiyabe û hwd. piştî wê demê xwendevan wê berhemê heta xala dawîn bê navber dixwîne. **Sindoqa Girtî** ya Lorîn S. Dogan di her liva xwe de xwendevan wisa radipêçe.

Di çîroka bi navê *Dawa Kirasê Dayê* de êşa herî mezin a cîhanê yanî şer hatiye vegotin. Lê di şer de jin an jî dayikek dikare çî bike, dikare çawa *siberojê* biparêze, travma û trajediya şer bi hestên zarokê bi navê Arî xwendevanan mit dike:

“Qey gule di dawa kirasê dayê de naçin? Qey gule nikarin dawa kirasê dayê qul bikin, dayê?” (r. 14) Bi hest û fêhengeke jinane ev çîrok û yê din jî hatine honandin. Bi qasî ku zarokê û pê re jî xwendevan di nava çîrokê de pê bawer bin ku dawa kirasê dayikekê dikare cîhanekê ji hemû xerabiyan biparêze. Di çîrokên vî pirtûkê de êş, tenêti, çûyîn û tiştên(!) lidûmayî di nava sindoqê te heta dawiyê girtî ne. Di wê sindoqa girtî de tenêti li dar e...

Di çîroka ku navê xwe daye pirtûkê, di *Sindoqa Girtî* de êşa ji jêr ve wekî kel-dûmana serşokekê bi ser tenêtiyê de difûre. Tenêti jî wê demê dibe *tunetiyek*: *Li ber neynikê, kirasê xwe dide ber xwe û tiliyên xwe li ser digirîne. Cihazê wê yê pêşî! “...” “Çil û heşt sal e di sindoqê de hilandî(!)”* (r. 63) Sindoqa tenêti ye. Neçarî û tarîti ye edî...

Tenêti, neçarî û êş gelek caran çûyînê diweldîne. Di pirtûkê de jî xwendevan vî yekê dibînin. Di çîroka bi navê *“Keç û Bav”* de tenêtiyek li rû ya malbatî vediguheze tenêtiyêke fizîkî. Keç û bav, piştî desthilatdariya bav a di nava malê de, bi demê re şopên gelekî kûr di jiyana wan de dihêle. Her çiqas germahiyek hebe jî tim li rû ji dîr ve ye. *“...Bavîti hîna di paşla min de birîneke qalîgirtiyê ku newêre der jî bibe!”* (r. 71)


Piştî çûyînê edî çîroka dawîn e. Gelek tiştên din li benda mirov in. Lorîn S. Dogan ji çîroka destpêkê heta taliya pirtûkê rêzik bi rêzik ruhê xwendevan mist dide. Û di *çîroka dawî* de ji xwendevan vî dixwîne; *“Hîna gelek çîrokên me hene em ji hevdu re bibêjin...”* (r. 95) Bi vî hevokê re, xwendevan edî xwe dide benda *Şeveke Dirêj*.

Sindoqa Girtî bi xwendevanan derdixwe rêwîtiyêke bi êş û bi tenêti heta dawiya pirtûkê rêwîtiya ku li her rawestgehê lehengekê lê zêde dibe tim zindî ye. Wek birîneke tim jan dide nahêle xwendevan ji bîr bike. Ew sindoqa girtî di hişê mirov de dibe motîfeke xurt a çîrokê.

Sindoqa Girtî, Lorîn S. Dogan, 95 rp, Weşanên Avesta, 2020



Taybetmendiyeên psîkolojîk ên faşîst



Dr. Abdullilah Polat

Taybetmendiyeên psîkolojîk ên faşîst ne tenê di kesên ku xwe wekî radikîl didin nasîn de hene, lê di heman demê de, di gelek kes û koman de dixuyê ku nirxeke cuda diparêzin, lê bi rengekî totalîter tevdiagerin. Ramanwerên ku li ser diyardeyên çandî yênan cuda kûrtir lêkolîn kirin, di nav de hêz çawa hişê civakan çêdike, hewl dan ku taybetmendiyeên psîkolojîk ên faşîstan li gorî wêjeya pirjimar a li ser mijarê destnîşan bikin. Mijar bi rastî pir girîng e ji ber ku îro mirov û dever hene ku wisa dixuyê ku nirxên pir maqûl diparêzin, lê taybetmendiyeên psîkolojîk ên faşîst di paşîn de nîşan didin. Di rastiyê de, ew ji kes û civakan re pir xesar in, ji ber ku ew têkiliyên civakî yênan newekhev û devjandî pêş dixin. Di tespîten derûnînasîyê de li ser vê mijarê, ew vê encamê destnîşan dikin ku faşîzm bi rastî helwestek durû û nakokî ye ku bi rengekî sofîstîke di hişên mirovan de digire. Ji ber vê sedemê, xwediye 13 taybetmendiyeên psîkolojîk ên faşîst e. Ur-Faşîzm her dem dikare di diyardeyên xwe yênan herî bêgûneh de vegere. Divê erka hemû mirovên hestiyar be ku her roj, li her devera cîhanê wê derxînin holê û her awayên wê yênan nû diyar bike. Di nav taybetmendiyeên psîkolojîk ên faşîst de sê celeb mezheb hene. Ya yekem kevneşopîya kevneşopiyê ye, digel referansên zanîna arkaîk. Ew daxwaza veqerandina zanyarî an pêşbîniyên ku berê hatine zêdekirin dikin. Ew rewş mîna wê ye ku bi hin nêzikatiyên Serdema Nû yênan ku di wateya arkaîk de qala "alkîmyayê" dikin. Ola duyemîn a ku ji hêla faşîstan ve tê meşandin, ola qehremanî û mirinê ye. Ew kiryarên mîrxasiyê pir mezin dikin û ramana ku mirin li ber van kiryarên lehengî bêqîmet e radigihînin. Ew li şûna ku wateyê bidin jiyane, giraniyê didin ser mirina rewşa. Her wisa, faşîst ji çanda çalakiyê re rêz digirin. Ji ber vê yekê, ew ramana ku raman wendakirina demê ye pêş dixin. Li gorî wan, rewşenbîr û hunermend ji tirsonek in heya ku karê wan banga çalakiyê teşwîq neke. Înkâr û dûrxistin, du taybetmendiyeên psîkolojîk ên faşîstan e. Faşîst nirxên civakî yênan ji hêla modernîte û ronahiye ve hatine xurt kirin red dikin. Ew her tiştî reş û spî dabêş dikin, ji ber vê yekê jî pêdivî ye

ku li ser wan nîqaş neyê kirin û bi rexneyî neyê dîtin. Ev çi ye? Tişteke ku em nîqaş bikin tune. Faşîzma ku ji vê hatiye raman-dina rexnegir jî red dike. Nakokî xiyaret e û hemû kesên ku cuda difikirin mixalefet in ku divê werin bêdeq kirin. Yek ji taybetmendiyeên psîkolojîk ên faşîst dê bêtehemuliya li ya cuda be.

Ev jî tîrsa cudahiye ye. Ya din dijmin e. Ew vê tîrsa ji dijminan mezin dikin, bi dayîna taybetiyên zêdegavî yênan ku wan li aliyekî xirab, nemirovane bi cih dikin. Ger hûn mîna wan nefikirin divê hûn ji xwe re nebêjin "mîrov". Di heman demê de ew ji destekê an qenciye kesên ku ne bi wan re ne jî hesûd in. Ev ji we re zêde xuya dike? Ya ku hin hezkiriyên futbolê dikin ne wusa ye?

Tîrs û mafdarbûn


Yek ji taybetmendiyeên psîkolojîk ên herî berbiçav ên faşîst neteweperestî û biyanîbûn e. Rastkirin û redkirina wisa ne tenê bi têkiliya bi welatê jêderk, lê di heman demê de bi nasnameya komek an devereke taybetî jî xwe dide der. Ew aliyên erênî yênan koma xwe zêde girîng dikin û tiştê ku ji wan re xerîb e red dikin. Faşîzm jî elîtîst e. Ew hejar an bêmal, ku ew wan wekî heyînen nîzm dinirxîne, biçûk dibîne. Ji bo wî, dewlemendî qedrê kesînan jî diyar dike. Ew her şeweyek qelsbûnê û her weha diyardeyek ku dikare

wekî nîşana lawazbûnê were şîrovekirin, red dike. Faşîst di heman demê de pîrsgerêka zayendî jî bi kar tînin da ku bi cidî cudakariyê bikin. Berê şovîzîzm serdest bû, lê îro ev bêtehemulî li hin deverên tevgera femînîst û tevgera LGTBA jî tê dîtin.

Taybetmendiyeên din ên psîkolojîk ên faşîst

Diyar dike ku armanca sereke ya ramanên faşîst çîna navîn e. Ew sektora civakî-aborî ya dînamîkî ye ku cihê wê bi tevahî nayê pênasekirin. Ji ber vê yekê, ew ji manipûlasyonê re pir kêr e. Taybetmendiyeke din a ku di faşîzmê de heye rûmetkirina şer e. Faşîst vê qebûl nekin jî anti-aşîtxwaz in. Ew bawer dikin ku awayê çêtirin ji bo "çareserkirina nakokî yekcar û her" tundûtûjî ye, ango, "hinekî dem bidin yekê".

Di dawiyê de, ji taybetmendiyeên psîkolojîk ên faşîstan yek taybetmendiyeke hûr û balkêş heye. Psîkiyatîst qala diyardeyê bi navê "Newspeak" dikin. Ew li ser karanîna zimaneke pir hêsan û xirab e, ji ber ku tenê bi saya vê xizaniyê dikare ramana tevlihev û rexnegir bêbandor bibe. Baş e ku meriv bifikire ka çî an kî bi danasîna taybetmendiyeên psîkolojîk ên faşîst re dike yek. Girîng e ku em xwe ji helwestên ramana totalîter ku di rabirdûyê de gelek zirar dane û îro jî hene, biparêzin.



Seyidxan Anter

Em û Sînor

Di şewbêrêkê ji yênan li Amedê de, guftûgo li ser pirtûka "Sînor" ya Menaf Osman çêbû. Lê xala me ne ev e, bila bimîne carekê din.

Sala 1639'an, li gorî peymana Qesra Şêrîn (Kasr-i Şerîn), Împaratoriya Osmanî û Safewîyan di nabêna Kurdistan û Kurdistanê de sînor danîn. Sînorê îro yênan di nav Îran û Tirkîyê de. Vî sînorî çî bi serê bindest û hejaran, nemazê yê şikakiyan de aniye hûn dizanin. Beriya çend hefteyan çend kesên ku ji bo geza nanê xwe di navbera sînoran de diçin û tînan, hatin kuştin. Xwîna van kolberan li ser vî sînorî hîna jî zuha nebû ye. Karê kolberan ne hêsan e; çaxa artêşa tirk keysê li wan neyane, ew dibin nêçîra leşkerên faris.

Dr. Hikmet Kivîlcimli di teza xwe ya li ser dîroka de cî dide pêwendiyên civakî

û aborî yênan di nav kurdan de. Çalaki û qaçaqxçîtiya li ser sînoran xalek sereke ye. Ev kar hîn jî dom dike. Kurdên nêzikî sînoran, ji bo debara xwe bikin bi zarok, xort, peyê û ajalên ve li sînoran didin. Mîna çavkaniya helbesta Ahmet Arif ya "33 guleyên" li Geliyê Zîlan, Qetlîama Roboskê jî ketiye bîrewerîya dîrokî ya kurdan û dostên wan de.

Bi şerê cîhanê yê yekemîn ve, sala 1916 li gorî peymana Sykes-Picot, xeta trêne ya Haydar Paşa - Bexdayê, bêyî ji kurdan bipirsîn wek sînor hilbijartin. 23'yê tîrmeha 1939'an, piştî gotinên; "Alahvekil biz turk." Hatay jî li vî sînorî zêde bû. Erê, erê...

Sînor malbatên me ji hev cuda kirin. Nêvî ji me li serxetê û nêvî li binxetê man. Min meraqê dikir ka merivên min yênan ji aliyê bav de li Qamişlo, Gîrbawî,

Xecokê û gundên din û ji hêla dê ve, li Amûdê û Himîsê kî ne, çawa ne û di çî rewşê de ne? Sala 1984'an, di 32 saliya xwe de, min fersendê dît ez çûm binxetê, ne ji Kurdistanê lê ji Swêdê.

Nîsêbînê li hember Qamişlo li rexê din yê sînor e. Li Sûka Qaçaxçiyên hejmarek mîrov hinek ji wan bi lingekî, hin jî bi destekî bûn. Li dorê berê Aşê Wawîka, laşên gelek kesan ji wawîkan re bûne şiv. Gundê bi offsa zad Aredê, li jêra Qoserê li ser sînor e. Li gorî gotinê gelek ajalên Aradê sê lingî bûn. Mayînen nav mîrgê ew seqet û birîndar kiribûn.

Gelo kî tîra xwe dizane bê ev sînor bûye şahidê çî û ji çî re nebûye şahid? Beriya her kesî ji liciyan bipirsîn. Sînoran licî fêrî "zîmanê çûkan" jî kirine. Yilmaz Guney di filmê Seyithan de sînor

aniye rojevê. Di filmekî din de, hespa kehêl, serî hildayî, teriya wê di ser serê siwarê wê re, hesp bi çargavî û siwarî bi kilamê, ber bi aso ve mij û moranê li dûv xwe dihêlin.!! Li deşta Heranê ev sînor çibû, çî ye û dê çî bi xwe re bîne, carekê din nîşanî me dide.

Di van deh salên dawî de, piştî deskevîtan kurdan li sînorên parçekirî yênan Kurdistanê bêhtir dibin kontrolê de ne. Nemazê sînorê navbêna Binxet û Serxetê. Ji xeynî tel û mayînan, dîwarên hazir yênan betonê jî li seranserê vî sînorî danîne. Hoya vê yekê, wek hûn dizanin deskevîtan kurdan e.

Kapîtalîzmê sînor kişandine, dewletê sînor asêtir, kolonyalîzmê û emperyalîzmê sînor hovtir û hartir kirine, bêhtir nirxên mirovan bin pê dike û xwîna mirovan erzan kirine. Bala xwe bidinê sînorên nav sermayeyê ji zû de rabûne, lê sînorên nav neteweyan, nav mirovan xedartir bûne. Me digot qey sînor li deryayê tune ne, ne wilo derket. Ji dengiz ya Egeyê sembola trajedî û barbarîyê bipirsîn, ji Alan kurdî bipirsîn!

Sînor ne tenê ev e, ê em vedibêjin. Li gorî çirok û çivanokan ji roja roj de sînor di nav mirovan de pêk anîne. "Tu sêvê nexwî ha!" û mar nîşanî Hawa (Eva) dane. Sînorên newekhevîya nav cîns û mirovan, sînorên şer yênan nav olan, sînorên aborî yênan karker û kedkaran, sînorên oldaran, sînor ji dadmendiye re, sînor ji evîn û hezkirinê re, ji azadiya bîr û bawerîyan re, sînor, sînor, sînor...

Her çiqasî li seranserê cîhanê pêlên nû yênan siyasî dixwazin her cure sînoran zor û asê bikin jî gava em bala xwe didinê û mîna rastiyê têdîgihîtinê û wê qebûl dikin, em ê bi ser rastiyekê ve bin: Pevçûna nav pêşketina hêza berhemê û pêwendiyên berhemê, zorê li sînorên wekhevî, dadmendî, hewkariyê dike. Sosyalyzasyon doza serfirazî û azadiyê (azadiya bi xwe jî di nav de) dike. Bidestxistina azadiyê bi te, bi min, bi me ve, bi hêza civakî ya dikare hem xwe û hem jî her kesî serfiraz bike ve girêdayiye. Serfirazî sînoran naxwaze! Ma te got çî?



Dewey Ma

Cemil Oguz

cemilo@diyarname.com

Veng

Filmêk ê derhênerê yewnanî Theo Angelopoulos esto. Sehne meclîse de derbas beno. Meclîso ke me-bûsî heme her game kenê qelebalix, meclîsê ke mebûsî her têdir danê pêro... Mebûsêk qeybî xebêrdanî şîno verê kursîya xebêrdanî. Verê kursî de wo la xebêrî nêdano. 10 saniye, 20, nîm deqe... Mebûsê bînî dest bi hume gume kenê. 40 saniye, 50, deqe... Veng mebûsan ra beno berz. Îtiraz, veng vetiş, qelebalix, ê ke vanê de hadê, ê ke vane ti çî rê xebêrî nêdanê... Bi eno tewir sehne dewam kenê. Tam ke hendî mebûsî biyê sûre, mebûsê verê kursî de dest pa kenê:

- "Gere merdim re rey huş bibo. Wexto varan bivaro gere merdim huş bibo. Huş bibo û goş bido vengê pey varanî."

Dimay enî vatişî ra mebûs yeno war û meclîsî ra kuno teber, şîno û hey şîno. A roje ra pey jo nêzane ew şî çîya. Film de derhêner Angelopoulos kuno serê rêça ê mebûsî û wazeno ê bivîno. Û hikayeyê filmî rey de bi eno awa dewam kenê.

Ene niste roja 04.06.2021 de hame nuştîş. Tora Çand û Zimanê Kurdî û Platforma Ziman biryar gi-rewt bî ke 3'ê aşme Cizîr de, 4'ê aşme Wan de, 7'ê aşme de zî Amed de Mîtinê Zivanî virazîyo. Cizîr de mîting hame qedexekerdiş. Erê, mîting hame qedexekerdiş.

Mîtingê zivanî.

Sîyasat çîniyo, weko bîn çîke çîniyo.

Tena zivan.

Mîtingê zivanî...

Wexto mi ene nuşte nuşte hema wextê mîtingê Wan û Amedî nîyamebî. Ez nêzana go ewca se bibo, la mesela wina nîya. Peynî peynî de mîtingê ke hamebî qedexekerdiş. Erê şar verê avahîya HDP'î ya Cizre de hame têhet û ewca waştîşê xo ard zivan. Ê xeber dayî û waştî zivanê kurdî bibo zivanê fermî û zivanê perwerdehî, la peynî peynî de mîting de mesûm, mîtingê zivanî hamebî qedexekerdiş.

Cayo ke endêke qelebalix bibo, endêke zivanî bibê, şar bi zivanê xo xeber bidê, pê perwerdehî bivînê, zivanê înan zivanê fermî bo, rewşêka aneyîne de ma go se bikerê? Ma go zey mebûsanê filmê Angelopoulosî de hema bikerê pe-lebalix bi zimanê şarî, yan ma go zey ê mebûsî ke fek heme çî ra vevêra û şî, ma go zî şorin?

Ma go şorin çî ya?

Ca esto ma şin?

Ma go qey bî zivanê xo bibê veng, yan huş bibê û bibê bêvengî?

Ma go qedexeyanê serê zivanê xo de qebûl bikerê û reyna bi zivanê serdestan jiyana xo dewam bikerê, yan ma go zivanê xo de israr bikerê û ê zivanî tewf zehf raver berê?

Heme çî di destê ma de wo nê?

Şima va çî?

Veng, an bêvengî?

Swêdî de polîtîkayê krîmînalîzekerdişê kurdan

Helîn Uzel

Dewleta Swêdî polîtîkaya xo ya dersî-norkerdişê kurdê Bakûrê Kurdistanî domnena. Hukmatê Swêdî hetêk ra bi eşkerayîyan paştî dano kurdan û êrîşanê dewleta tirke yo vera şarê kurd û muxalefetî şermizar kenê. Heto bîn ra zî waştekanê îltîcayê kurdan ê Bakûrê Kurdistanî red kenê. Serdozgerîya Swêdî Hezîrana 2019î de bi kombîyîşêk çapemenîye da zanayene ke înan dosyaya kiştîşê serokwezîrê Swêdî yo verên Olof Palme padayo. Amebî eşkerakerdene ke ti eleqeya kurdan kiştîşê Palme reyde çîniyo û ame vatene ke PKK partîya ke seba heqanê kurdan tekoşîn dana yo. Eşkerayîye ra dima rêxistinê kurdan, roşnîr, nûstox û rêxistinê civako sîvîlî yê Swêdî waştî ke wa Swêd kurdan ra uzrê xo biwazo û bi Yewîya Ewropa reyde PKK listeya terorî ra vejo. La Swêd herinda ke kurdan ra uzrê xo biwazo, vera kurdê ke bi zextê dewleta tirke Swêdî de îltîca kenê helwesta xo tujêr kerd. Swêd eynî wext de no polîtîkayê xo yê tujî vera kurdê ke hemwelatîye Ewropayî zî pêk ano.

Hukmetê Swêdî dayîka 2 domanan Zozan Buyuk Ariye aşma Adare de dersînor kerdbî. Zozan hemwelatîya Belçîka ya û heqê aye yê mendîşê welatanê Ewropa zî esta. Zozan 5 serrî ra ver Swêdî de zewicîyaye û xebitîyayêne. Rixmê naye, Buroya Koçberan bi îddîyayê Polîsanê Ewleyîya Swêdî (SAPO) qerar dayî ke çîniya kurd Zozane bêra dersînor kedene. Ya sosrete zî aya ke Polîsanê Ewleyîya Swêdî Zozane zêy 'taluke' nişan dayî û xênce naye çîyêk bîn nêvatî. Sebebê nişandayîşî Zozane ya zêy 'taluke' çîyo, eşkera nêkerdî û nêkenê zî. Naye sero Buroya Koçberan Zozane dersînor kerd. Tenê Zozan nê, demê peyênan

de xeylê kurdê Bakûrî raştê polîtîkayê krîmînalîzekerdişî ameyî. Heminan ke seba îfade dayîşî bi Polîsanê Ewleyîya Swêdî reyde ronîştê raştê persanê 'Gelo PKK û HDP heman rêxistine yê? Bi goreye to PKK rêxistinêka terorî ya yan nê? Ti derheqê Abdullah Ocalanî de çî fikrîyanê?' ameyî. Çi ecêbo ke nêy persî şîbyenê persanê MÎTê dewleta tirke.

Tewr peyênî çîniya bi nameyê Rozerîne raştê nêy zextan ameye. Rozerîne di serrî yo ke ameya Swêdî û hemwelatîya Swêdî ya. Rozerîne daîreyêka dewlete de xebitîyena û camêrdêko hemwelatîyê Tirkîya ra yo reyde zewicîyaya. Polîsanê Ewleyîya Swêdî reyda îddîya kenê ke Rozerîne seba dewleta Swêdî 'taluke' ya. Na sebeb ra zî Buroya Koçberan îltîcayê mêrdeyê aye (Kawa) redd kerd û qerarê dersînorkerdişî da. Polîs sebebê talukenîşandayîşê Rozerîne zî eşkera nêkenê. Rozerîne demêke bi awayêko aktif mîyanê xebatanê saziya legal ya

kurdan Navenda Civaka Demokratîke ya Kurde ya Swêdî de ca girewtbî. Wextê şerê Kobanê û wextê weçîna-yîşî ke HDP reya yewine dekewt meclîse de xebat rayirberdêne. Rozerîne ti karêke îlegalî de ca nêgirewta û sîcîlê aye paka. Heke mêrdeyê Rozerîne bêro dersînor kedene, beno ke Rozerîne zî bi ci reyde şêra Tirkîya. La Rozerîne kesêk ke muxalefetê hukmatê tirke ya û na yew do seba aye bibo pirsgirek. Helbet heke îstîxbaratê welatan derheqê kesêke de agahîyan danê û gênê se, do no kes raştê bîngkerdişê heqanê merdiman bêro. Heke Rozerîne mêrdeyê xo reyde nêşîra Tirkîya zî do lajê aye û pitikê aye ke hema nêwelidîyayo Swêdî de bîmanê. Bi vatîşêk bîn do malbatêk bîn bi polîtîkayê krîmînalîzekerdişî bêro perçekerdene.

Nêy kerdeneyê dewleta Swêdî xeylê persan dekenê hişê merdiman. Çapemenîya girêdayeyê dewleta tirke Seta serra 2019î de raporêk eşkera

kerdbî û nameyê rêxistinê kurdan ê Ewropa û kurdî zêy sempatîzanê ter-orî bi name kerdbî. No raporî de name û wêneyê serekê verênî yê Par-tîya Çep ya Swêdî Jonas Sjostedt zî derbas bî. Gelo dewletê Swêd û Tir-kîya agahîyan danê yewbînan? Se-bebê nê persî oyo ke hewceyîya Polîsanê Ewleyîya Swêdî bi agahîyanê derheqê çeteyanê DAİŞî ke rayanê îl-legalî ra yenê Swêdî, esta. Zafê nêy çeteyan zî Tirkîya ra derbasê Ewropa benê û agahîya dewlete nînan ra esto. Beno ke dewleta tirke vera dayîşî aga-hîyî, wazenê derheqê kurdê Swêdî ke dewleta tirke rexne kenê de agahîyî bigêrî û derheqê înan de doze abi-kerê. Na yew nîna zanayene. La belê şarê kurd û wekilanê Swêdî bifikarî ke do mabenê kurdê Swêdî û dewlete de krîzêk bivejîyo. Zêy wextê kiştîşê Olof Palmeyî. Rixmo ke ti eleqeya kurdan bi kiştîşê Palme çînê bi, kurdî ameyî krîmînalîzekerdene û şopê nêy zextan ewro zî şarê kurd ser o de estê.



Fırçeya Şikite

Gulçîn Adar

Her cografya goreyê xo taybetmendîyê ci estê û Kurdistan de zî şaristanan ra bigî qezayan, qezayan ra bigî dewan heta gomeyan mîyanê xo de taybetmendîyê dewlemendan hewênênê. Gama ke merdim ewnîyeno xozaya Kurdistanî vano ke cennet no ware yo. Her herême bi xozaya xo merdimî sermest kena. Bi koyanê xo yê berzî û aseyan, bi vilanê xo yê reng û rengînan dîmenêk bêhempa vernîya merdimî de rafîna.

Merdîm Kurdistan de eşkeno serê koyêk berzî de pêro emrê xo temaşkerdişê dîmenî de derbas bikero. Taybet zî menga wisarî de. Wisar pêro wişk û giraniya zimistanî, serd û seqemê ci serê xo ra erzeno û bi her tewir rengan rîyê xo pêro ganeyan rê ramojneno. Enerjîya wisarî senî serê ganeyan de bi hawayêk pozîtif tesîr kena, eynî tewir merdim xozaya de zî na enerjî vînenê. Ka ma biewnê vilê ke wisar de zerrîya ma weş kenê kam ci yê.

Bi germîyayîşê hawa û enerjîya zêde de tewr verên vilan de pîvoke rîyê xo ma rê ramojnena û sîlam dana. Gama ke hema vevre newe newe helêna aye bi pêro weşîkîya xo, bi rengê xo yê morî vejêna meydan. Merdim o wext zano ke êdî germîyayîş nêzdî yo û êdî do serd ma ra xatir biwazo. Her çiqas tewr verên pîvoke ma rê mijdîyanê wisarî bido zî la emrê ci zaf tayo. Coka yê ke wazenê rastê ci bêrê, ganî lez têbigeyrê û a weşîkî ra bêpar nêmanê.

Sosîne zî keyeyê pîvoke ra ya û ma rê çim şiknena. Sosîne vana ha ez zî tîyaya. Bi rengê xo yê zerdî û menga adare de bi boya xo ya weşe xebere dana ma. Sosîne sey waya xo ya pîvoke zaf tay ciwîyena. Adar de vejêna û Nîsane de ma ra xatir wazena. Eke şîma wazenê weşîkîya ci de mest bibê, emrê ci rê baldar bê.

Yew vila balkêşe zî Tumanê leglege ya. Samedê dergîya govdeyê ci, wina ameya binamekerdene. Gov-

deyê ci zergûn o û hîrê movikî estê ser de. Rengê ci mor o û heta menga gulane bi weşîkîya xo xozaya xemilnena.

Pirpîzêke qeraxê koyan de menga Adarî de bena zergûn û bi weşîkîya xo ya bêhempa weşî dana ma. Rengê ci gewr û sîya yo û samedê dermanî zî yena werdiş.

Hîlo; her mîntiqayê Kurdistanî de bena zergûn. Hîrê rengê ci estê. Pembe, sipey û lîla. Xeylê çîniyî samedê porê înan nerm û weş bo awa hîlo xebitnenê. Heta hamnanî zergûn manena.

Kesê ke rastê Îbrehîm û Çîbrehîm nêameyê çîn ê. Na vile senî ke dewan de bena zergûn, enyî ca de bajarên de zî vejêna vernîya merdimî. Vilêke bi înad û wişk a. Rengê ci; sipey, zerdik û pembe yo. Wisar de vejena, heta hamnanî zergûn manena. Samedê xeylê nêweşîyan yena xebitnayene.

Adarok; sey ke nameyê xo ser de

ya, menga Adarî de vejêna. Tewirê renganê ci lîla, sîya û krem o. Emrê ci zaf kilm o û tena mengêk rîyê erdî manena.

Vila ke şîbyena veyvan vila ke tûtîtî de kayê tutan de ca gêna vila Bûkûke ya. Şaxê ci derg û rengê aye hem sûre û hem zî pembe esto. Na vile ma ra errey xatir wazena.

Sabûnê Çûçikan; çîçegê ci sipeyê û heta hamnanî emrê înan esto.

Laflafok; sey pêçeke ya. Rengê ci krem û mor o.

Zergulik; sey gulê arzû yê û rengê înan zerd o û dimayê ke pelê xo weşenenê benê şilike.

Helbet tena nê vilî nêyê. Bi hezaran tewirê vilan Kurdistanî de benê zergûn û ruh û zerrîya ma de şax danê. Wa zerrîya ma zî sey nê vilikanê renginan weş û rengo rengo biba û qet pelanê xo nêweşêna. Wa zerrîya merdimayî timî sey wisarî zergûn biba û rengê xirabî nêdekewî dinyaya rengin û xira nêkera.

Kurdistan cennetê vilikan o



Şujin

Dildarê Amedê

Rêbaza diya min

Bi rastî jî heta ku dê û bav li jiyane ne mirov zêde bi qedir û qîmetê wan nîzane lê piştî ku ji vî dinyayê koç dikin mirov nû giringiyê dide wan û qedir û qîmetê wan nas dike, lê wekî dibêjin piştî çî.

Bawer im ev yek bi serê we tevan hatiye, dema ku me zirarek an jî şaşîtiyek dikir her çendî dayika me bi me re hêrs dibû jî ji bo ku bavê me li me nede jê re nedigot û ew kirina me wekî sir û razekî di hundirê dilê xwe de vedîşart.

Carinan jî ew wekî gef li hemberî me bi kar dianî û digot: "Heke hûn filan tiştî bikin ez ê ji bavê were bêjim." Lê tucaran nedigot tenê em pê dixapandin da ku em hinekî bi ya wê bikin.

Bi her halî, wekî hûn dizanin gelek rê û rêbazên dayikan hebûn ku pê kontrola zarokên xwe bikin. Yek ji wan rêbazên ku gelekî bala min kişand ev bû. Hevalekî min hebû gelekî vedixwar û hema bêje di hefteyê de çend rojan serxweş diçû malê. Wî hevalî behsa rêbaza diya xwe kir ku çawa wî kontrol dike û wiha got:

"Her ku ez bi şev dereng vedigeriyam malê min didît hîna diya min şiyar e, derzî û ta di destê wê de ye. Ji min re digot ka kurê min çavê min baş nabîne ji min re ta bi derziyê veke. Piştî demeke dirêj min nas kir ku diya min ji bo çî wiha dikir. Ew rêbaza wê bû ji bo ku bizanibe gelo min tişteke vexwariye û ez serxweş im an ne serxweş im. Heke min karîba ta bi derziyê ve bikim wê gavê ez serkeftî ji azmûnê derdiketim. Heke min nîkarîba ta bi derziyê ve bikim wê gavê nas dikir ku ez serxweş im."

Îca gelfî hêjayan min xwest ku wê serpêhatiya hevalê xwe bi we re parve bikim û beriya xatir ji we bixwazim ez ê tişteki ji we re bêjim: "Teqez qedir û qîmetê dayik û bavên bizanîbin û tu caran dilê wan nehêlin, bi taybetî jî yê dayikan. Kesên ku dayika wan sax be xwedê temenê wê dirêj bike û kesên ku dayika wan ne li jiyane be xwedê bi rehma xwe şa bike.



Tiştanok (mamik)

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bi hêvî ne ku bi dilê we be. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin E-maila rojnameyê da ku em wan jî biweşînin.


1- "Tişteke min heye Çûme ji vî rê û pê de Tişteki di rê de Lingê li ser pê de De bêjin ew çî ye?"

2- "Tişteke min heye Ez çûme mala mîr Pirsiyar dikim ji mirovên pîr Kî dîtiye teyrê bi şîr?"

Çavkanî: Mamikên Botanê Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî

Bersivên me ev in: 1-Kultî 2-Pêşî

XAÇEPIRS



Jİ ÇEPÊ BER BI RASTÊ


- 3. Pêxemberek 5. Cînavkeke pirhejmarî 7. Şaş, ne li rê 8. Daçekek
- 9. Derewîn, kesên ku tiştên ne rast dibêjin 13. Heywaneke kovî di çîrokên de bi xapên xwe navdar e
- 14. Alaveke mûzîkê 16. Zehmet 19. Balindeyeke kedîkirî
- 20. Cînavkeke pirsyariyê 21. Dîn, no, nehs 22. Hiş
- 25. Dixan 26. Xem, keder 28. Cehenem

Jİ JOR BER BI JÊR

- 1. Mecbûrî, bêmecalî
- 2. Kesê ku li pêşiya xelkê nimêj dike
- 3. Kar
- 4. Arvan, genimê hêrayî
- 6. Alav, agirê gur
- 10. Rengek
- 11. Heşere, li hin deveran dibêjin bihok
- 12. Kesên ku çavên wan nabîne
- 15. Xirabûyî, qirêj
- 17. Koma pez
- 18. Madeyeke ku teqîn jê çêdibe, pîşo
- 20. Berpîrsê kilîseyê, rayeyeke oldariyê
- 23. Kok, damar
- 24. Tayê qalind, an jî werîsê tenik
- 27. Notayeke mûzîkê

Bersiva hefteya borî





KitêbXaneyâ CAB

Yaqob Tilermenî

Hinek Henek

Hunermendê Îtalî Salvatore Garau peykerekî nexuyayî yê di warê fizîkî de bê-hebûnî yê ku ne di warê çapê û ne jî di warê dijîtalî de temsîla wê tune, afirand. Tekane rêya îsbatkirina hebûna berhemê jî, sertîfîkayê fermî ye. Xebata wî ya bi navê Ez, di 18'ê Gulana 2021'ê de mezadê de bi 15 hezar Euroyan hate firotin. Kesên ku ev peyker(ê tune) standine divê peykêr li odeyê vala û li cihekî pîvanên 150x150 santîmetre bidin pêşandan.

Dema mirov di şert û mercên herî dijwar de li kirrîn û firotineke wiha dibe şahid û li gora rasteqîniya jiyane vê rewşê dinirxîne di serî de hinekî li bûyerê, pişt re hinekî li xwe û herî dawî jî hinekî li tevliheviya jiyane şaşwaz dimîne û pêdiviyekê bi lêfikirîneke kûr çêdibe. Helbet ev rewş ne rewşeke qerf û henekan e. Peykersazek heye, peykerek afirandiyê û ev peyker jî ji teref mirovan ve bi çavên serriyan ve nayê dîtin. Mesele dibe mijareke feylesofî ku divê mirov serê xwe pê re biêşîne.

Jixwe di hunerê de rêyên curbucur hene ku her berhema afirandî li gora teşe û rêbazêke estetîkî bi wate û nav dike. Gotinên weke galte, qerf, henek, yarî, tehn, tinazî, tîrrane, pêkenok û hwd hene ku zehfê caran mirov wan di şûna hevdu de jî bi kar bîne, di rastiyê de her yek xwedî wateyê cuda û girîng e. Galte (gotinên jî bo kenînê), tehn (gotinên watedar ji bo



rexnekirinê), tinazî (gotinên ji teref her kesî ve tene zanîn, bi awayekî nîşandayîna ecêbî û berdîberdana wê=humor), tîrrane (îronî, bi awayekî berovajî nîşandana rastiyekê), henek, qerf, pêkenok, qeşmerî, yarî (gotinên ne cidî ji bo zarokan)...

Îcar mirov hebûna peykerê tune yê bi navê Ez dikare di nava van gotinan yekê de bi cih bike û zûzûka tevliheviya hişê xwe rawestîne. Lê ger hêla tîrrane yê ve afirandinê di serguh re were avêtin, xwegihandina heqîqeta watedariya afirîneriyê de winda bibe.

Mirov gelek caran di wêjeya devkî ya kurdî de rastî hêlên tîrrane, tinazî û qerfî tîn ku bi fêmdariya heqîqeta hêza gotinê, bi bişîrîn be jî ber-tekeke watedar nîşan dide. Mirov dikare ji bo

şênberkirina mijarê mînakeke wiha bide:

Cegerxwîn dema di ber mala axayekî re dibuhure bi dengê bilind dibêje:

-Qewet be ji te'r axayê keran!
Axa bi niv kenî bersivê dide:
-Rehme l'dê û bavê te be Seyda.
Xulamê axê bi dengê bilind dikênin û yek ji wan ji axê re dibêje:
-Axa, Seyda ji te re got, 'axayê keran'.

Axa bi ken li xulamê xwe vedigerîne:
-Na kurê min, ew ji we re dibêje, 'ker'.

Helbet Cegerxwîn hostayê peyv û qelemê bû û huner di her warê jiyane de bi kar dianî. Di gotinên xwe yê herî req û çors de jî, mirov ji xwe ne-

dixeyidand û giraniya xwe ya hunermendî bi wan dida pejirandin.

Ger di roja me de, em hunerên xwe ji hêlên wan ên tîrrane, tinazî, qerfî û henekî bêpar bihêlin, em ê nikaribin bi awayekî giştî çanda xwe ya qedîm derbasî nîfşên dahatûyê bikin. Ji ber ku hêza îronî û humorê berhe-man xurtir û mayîndetir dike. Ser meseleyê; kurdên ji ber şert û şirûtên neyînî ji bêgavî welatê xwe terikandine û li welatên xerîb niştecih bûne, ji ber asimilasyon û entegrasyonê roj bi roj zarokên xwe ji dest didin. Çiqas jî bo fêrbûna zimanê kurdî hewl bidin jî, bi awayekî giştî nikarin bi ser kevin. Lê ji hêleke dîtir ve dam û dezgehên ragihandin û çapemeniyê bi awayekî hêsanî dikarin bibin amûrên xurt ku wan zarokan ber bi çand û zimanên wan ve rakişîne.

Mînaka herî berbiçav, bernameya Hinek Henek a di Stêrk TV'yê de ye. Piştî temaşekirina her beşên vê şanoyê em bûn şahid ku her du zarokên me bi zimanekî sivik û gihîştî dikarin li zimanê xwe vegezin. Hem jî bi gotinên herî kurdewar û tinazkar daxwaz û merema xwe tînin zimên. Ger em dixwazin zarokên xwe ji çerxên pergalek asimilasyon û entegrasyonê biparêzin divê em li malên xwe kanalên televizyonên kurdî saz bikin û ji wan televizyonan bi heterî bixwazin ku bernameyên weke Hinek Henek bi domdarî biweşînin. Ji lewre Hinek Henek hem şanoya kurdî bi zarok û

mezinan dide hezkirin û nasandin û hem jî bi rêya qerf û henekan şîrnahiya zimanê kurdî dide fêrkirin. Belkî ev fêrkirin li dibistanan di wextên dîdirêj de bigihîje armanca xwe, lê dema mesele dibe dîtbarî û bihîstariya ser ekranên televizyonan ev fêrbûn di demeke kurt de digihîje armanca xwe. Û ekîba Hinek Henek dikarin bi taybetî ji bo zarokan lîstikan di bernameyên xwe de bi cih bikin û şanogerên dahatûyê bi hunera xwe derxine pêş.

Em dîsa vegezin ser mijara xwe ya destpêkê û çend nîrxandinan li ser peykerê tune bikin, em ê bibînin ku bûyera afirandina peykerekî û firotina wê ya di çapemeniya cîhanê de weke tinazkarî hatiye nîşandan di rastiyê de meseleya me ya hebûnê weke sîleyekê li ser çavên me dixê. Li gora gotinan, xebatên razber ên hunermend Garau bi ti awayî bandorê li derdorê nake. Li gora Garau jî, "Encama serketî ya mezadê rastiyêke tegez nîşan dide. Valahî, qadek tîjî enerjî temsîl dike. Ger em vala bihêlin û li dû tu tişt nemîne jî, li gora Regeza Nediariyê (fizîka kuantumê) giraniyêke tunebûnê heye. Ji ber wê valahî, xwedî enerjîyêke tîrbûyî ya xwe vediguherîne pirtîkên hinava mirov."

Û gotina herî dawî ya Salvatore Garau li ser peykerê Ez:

"Di serencamê de, ma em giş teşeyekî nadin Xwedayekî ku me ew tu caran nedîtîye?"

Wek bangewazî û bervêdanê huner



İlham Bakir

Marksîzm ji parçebûn û rûxandina civakê, pergala bûrjûwayê berpîrsiyar digire. Û wisa dinirxîne ku ev rizîn û parçebûn encameke xwezayî ye ku mirov bûye biyaniyê hilberîna xwe, beşeke civakê ji hilberîna dîr ketiye. Ew mirovahiya ku moral û motîvasiyona xwe ji nîrxên hevpar ên beriya şaristaniya navendî girtiye ji bo ku bikaribe vê parçebûyî û biyanîbûnê ji holê rake de bi awayekî rasteqîn bigihîje rizgariyê. Şaristaniya navendî û dewrewî ya pêncsed salên dawîn û modernîteya kapîtalîst ji civakbûnê derketin, civakbûneke ji derveyî civakbûna rasteqîn temsîl dike. Wisa be mirov de çawa bifikire? Gelo hunera ku di nav rewşeke wiha de xwe heylî kiriye parçeyê vê rastiyê ye yan di nav vê rastiyê de dijbertiyêke ontolojîk vedibêje.

Teodor Adorno dibêje ku huner di nav çewtiya pergala bûrjûwayê de pergala rastîya civakbûnê de xwe de dihe-wîne. Rastiya civaka bûrjûwayê jî berovajîti û çewtiya ku pergala bûrjûwazi-yê saz dike pêk tê. Lê huner li dijberî vê rewşê, di nav pergala bûrjûwayê de nûnertiya nîrxên serdema beriya civaka bûrjûwayê, heta beriya şaristaniya navendî dike. Ev nîrx, bîngehên xwe ji civakbûnê, parçenebûnê, biyanînebûnê digire. Ku mirov di vê çarçoveyê de li hunerê binihêre gotina "huner neynika civakê ye" yan jî "huner divê rastiyên

civakê vebêje" çiqasî bi niyeta baş bê gotin jî di nav xwe de çewtî û nakokiyêke mezin dihe-wîne. Xwediyên van gotinan dixwazin bibêjin ku huner divê li gor civakê rola xwe bileyze û rastiyên civakê bîne ziman. Lê mirov divê bibîne ku di rewşa heylî de rastîya civakê ne rastîya xwemal e. Rastiya civaka modernîteya kapîtalîst e. Ji ber vê yekê jî ev gotin encax xizmeta ji nû ve afirandin û berde-wamiya civaka bûrjûwayê pêk tîne.

Di vê çarçoveyê de mirov dikare bibêje ku erka hunerê, dayîna rastîya civakê ya heylî nîn e. Erka hunerê ew e ku ji rewşa civakbûna heylî re îtiraz bike û ji bo civakbûna rast a beriya parçebûnê hişyariyê bike. Mirov ji gotinên Adorno derkeve rê, huner, di eslê xwe de di nav çewtiyê de lêgerîna rastiyê ye. Gotina Adorno ya ku dibêje 'jiyana çewt, rast nayê jiyîn' mirov dikare biguherîne û bibêje 'huner di nav jiyana çewt de, ji yana rast vedibêje.' Rexnegirên bûrjûwayê dema ku dibêjin huner divê rastîya civakê bîne ziman, mebesta wan ne rastîya civaka hevpar û wekhev e. Civaka ku rexnegirên bûrjûwayê vedibêjin civaka bûrjûwayê ye. Ev gotin dixwaze bibêje ku civaka bûrjûwayê bêdawî ye, divê huner vê civakê û rastîya vê civakê bîne zimên û qeyranên, qirêjîyên vê civakê veşêre da ku civak nebîne. Di civaka bûrjûwayê de huner dijberî rizandina rastiyê çalakiyêke protestoyî ye, li hemberê kapîtalîzmê jî rexnegirî û dijberî ye. Nexwe erka hunerê ew nîn e ku rastîya tê jiyîn bîne zimên, erka hunerê ew e ku li ser nîrxên mirovahiye yê hevpar, li ser hîmên hebûna civaka cewherî mirovan hişyar dike da ku civak li van nîrxan



xwedî derkeve. Yanê huner jî vî tiştî berpîrsiyar e ku li ser rastîya berovajîtiya civaka îro destwerdaneke rewşenbîrî pêk bîne û vê rastiyê li rastîya xwe ya cewherî vegezinê.

Ew civaka ku heta hemû şaneyên xwe yek bi yek hatiye parçekirin, her parçe him bûye biyaniyê xwe hem jî biyaniyê parçeyên din, di nav vê rastiyê de huner lêgerîneke temambûnê ye di heman demê de. Ji nav yeknesakiya 'yê/a ku parçe bibe dibe biyaniyê xwe, yê/a ku biyan bibe parçe dibe' divê çareserîya 'yê/a ku temam bibe tê ser xwe, yê/a ku tê ser xwe temam dibe, di

temamiyê de xwe dibîne' biafirîne. Ev lêgerîn û çalakiya hunerê ya sereke û cewherî ye. Adorno dibêje, di nav jiyana modernîst de qada ku nehatiye parçekirin û temamiya xwe parastiyê tenê qada hunerê ye. Nexwe huner bervêdaneke dengbilind e ku di nav civaka ku bi destê bûrjûwazi-yê û şaristaniya navendî hatiye parçekirin û ji rastîya xwe dîr ketiye û bûye biyaniyê xwe, dibe bangewaziya derdorê, gettoyê, gund û hêzên derveyî şaristaniya navendî. Hunera ku xwediyê bervêdaneke nebe û bangî civakê neke, encax dikare bibe payandaya pergala civaka

bûrjûwayê. Ku mirov di van çarçoveyan de binirxîne û lê binihêre di civakeke wek ya Kurdistanê ya ku bi her awayî hatiye parçekirin de, divê huner beriya her tiştî li ser navê bindestan xwe li ser bervêdaneke xurt saz bike, hebûna xwe li ser bervêdan û bangewaziya ji bo azadiyê pêk bîne. Ji nav vê bervêdan û bangewazi-yê divê derfetên hilberînen hevpar bînin afirandin. Afirandina nîrxên komunal, bervêdan û bangewazi-yê divê ji bo çîrokên wêjeyî, ji bo çîrokên sînemaya Kurdistanê bibe bîngeh û cewhera vegotinê.

Nola pirpinîkên xwe li rohnkahiyê bigirin



Keştiya Alalû

Agît Yazar

...Em di rê de ne, diçin Hewlêrê û hîn ji ez paldayî me. Gotina; 'Heft xwezî bi Sedam. Desthilatdarî ket destê kurda, malik li me virritî' min ji nava xeyalên kûr vediciniqîne. Xwediyê vê gotinê kurdekî ji başûrê Kurdistanê ye. Vê gotinê bi kurdiyê zelal dibêje.

Gava gotina xwe bi dawî dike, zimanê xwe bi gotina xwe re dadigire. Ji babetê axaftina wî diyar dibe, kirrekir ji kezeba wî tê. Ew çend gotinê ji dil dibêje, paşê jî nola şekirekî bixwe, wanî bi mirçemirç xwêziya xwe di ser gotinên xwe de dadigirtine.

Başûrî xweziyê bi Sedam tînin!

Di destpêkê de min di dilê xwe de got, "An ev sîxwure partyeke kurda ye, an jî kesekî xwiriya ye." Lê paşîya paşî ez ê lê hay bibim go ev nêrîneke berbelav e. Ew çend berbelav e, ez dibêim, "Heke li gorî vê rewşê, Sedamê şeytanqûnî ji tîrbê rabe û li herêma kurdan tê-keve pêşbirka hilbijartinê, ew ê li hember rêvebirên kurdan bi rêjeyê gelekî bilind bi ser bikeve."

Gotinên rêwiya nepen

Digel ku tu kes bersiva rêwiya nepen nade û tiştekî jê napirse jî, camêr gotina xwe dikudîne: "Erê, di dema Sedam de em bindest bûn, qet nebe em dewlemend bûn. Lê niha em hem bindest in, hem jî xizan in. Ka me çî ji xwe fahm kir!"

Em êdî ketine nava bajarê Hewlêrê. Gotinên wî rêwiya ku wî jî nizanibû ka ew ji kê re dipeyive, di tasa serê min de xwe ducar dike û olan dide: "Sed carî xwezî ne bi dilê serok û serkêşan!"

Xwedê neke, ez vê rewşê li xwe miqayese dikim. Heke ez bim, di ser van gotinên xelkê re, ez ê kevirekî bi qirpika nigê xwe ve gire bidim û xwe biavêjim nava çemê Dîjleyê. Bi wî awayî ez ê xelkê ji xwe pak bikim. Heke xelkê xwezîya xwe bi serokatîya qesabekî nola Sedam bîne, ê de hema meriv bijî ji çî re ye qeyi!?

Îşê mazûbanê min zor e

Mazûbanê min bi kar û barê dostekî xwe re mijûl e. Li alîkî ez û li aliyê din kar û barê dostê wî. Ev rewşa hanê, mazûbanê min hinekî şerpeze kiriye.

Hin mehkûmên farisan, hin yên tirkan û hin jî yên ereban bûn. Sûcê wan yên hevbeş, kurdbûyina wan bû. Nola pirpinîka xwe li rohnkahiyê bigirin, hatibûn xwe li vê beşa welatê xwe yê piçekî azad girtibûn. Paşê li xwe hay bûbûn ku ew rohnkahî dê wan bişewitînin

Karê mazûbanê min ew şerpeze kiriye, kirrî û firotina erebeyekê ye. Dostekî mazûbanê min ereba xwe daye li ber firotanê, dostekî wî yê din jî bûye bikirrê wê erebê. Mazûbanê min jî ketiye navbera her du dostên xwe. Îşê wî zor e. Yek dixwaze ereba xwe biha bifiroşe, yek jî dixwaze erzan bistîne. Lê mazûbanê min li xwe naşikîne. Diyar e tecrûbeyê xwe ya jiyane tîra xwe heye. Lema jî mazûbanê min, hûr dajo/kûr dajo/lêw belê ga jî naêşîne.

Mazûbanê min peywira noter dibîne û ji her du aliyên re jî dibe kefil. Destê her duyan dide hev, ew jî bi destê her duyan digire û destê wan hil-diteqilîne. Yek ji wî, yek ji wî û yek ji yê din. Gotina dawî ya mazûbanê min û ew bazarê diqetîne.

Dibe êvar. Yê erebe kirrî, yê firot û di gel çend nas dostên wekî din, em li malekê dibin mêvan. Her yek ji wan nigê xwe di gelek feqan de kotîne. Tecrûbeyên wan yê jiyane ango ezmunên wan yên jiyana civakî pirr in. Ketin û rabûnê baş dizanin.

Yek ji wan ji min dipirse; "Êêê. Te welatê me çawa dît?" (Qesta wî ya ji 'welatê me' ew e, ango qala başûrê welat dike)

"Nebêje kurd im, bibêje tirk im."

Hîn min xwe ji bersiva wî re amade dikir. Yekî din xwe di nav re dike, dibêje: "Ji bo qedrê te were girtin, li vê derê ji kesekî re nebêje ez kurd im. Bibêje ez tirk im." Paşê destê xwe nola îşareta 'gurbozan' dike dibêje; "Bibêje ez ev im!" Bi kenekî pilore, serê xwe paşve xwar dike, bi denekî hêla di-kene. Ji ken wêdetir, edetî nola hespekî dihîrre.

Nizanim çima, lê hema ez bersiva yekî jî nadim. Ez bi îroniya xwediyê îşareta 'gurbozan' ya bêxwê jî nakenim. Ez wî şermezar jî nakim.

Sûcê wan kurdbûyîn bû

Her yek ji van kesên li civatê rûniştî, ji nava dojehekê filitîne û hatine, li vî bajarî gihîştine hev. Hinek ji Rojhilat, hinek ji Bakur û hinek ji Rojava bûn. Hin mehkûmên farisan, hin yên tirkan û hin jî yên ereban bûn. Sûcê wan yên hevbeş, kurdbûyina wan bû. Nola pirpinîka xwe li rohnkahiyê bigirin, hatibûn xwe li



vê beşa welatê xwe yê piçekî azad girtibûn. Paşê li xwe hay bûbûn ku ew rohnkahî dê wan bişewitînin.

Her diçe, civat germ dibe; peyv li peyvê dikeve û gotin li hev zêde dibin. Mijar tê li ser zindanan disekine.

Ji gotinên wan tê fêhmkirin: Eger zindananê Tirkiyeyê dojehe bin, yên başûr esfelesafilîn e.

Yek ji wan qala rewşa zindananê Başûr dike û dibêje: "DAIŞ'î û yên li hemberî wan şerr kirine bi hev re di nava yek hucreyê de ne. Hucre jî çî, hucre!"

Vebêjer, ew jûra em lê rûniştîne destnîşan dike, dibêje; "Aha firehiya wê bi qasî vê jûrê ye. Lê zêdeyî sed girtî têde li ser stuyê hev in"

Yekî din gotinê jî devê vebêjerê yek werdigire û ew êdî lêzêde dike: "Bavo ji dêlva hûn bikevin zindananê vana (qala rêveberiya başûrê Kurdistanê dike) hema derbekê bera serê xwe de û xwe ji vê dinyalîkê pak bike, biçê."

Ji axaftinê wan eyan dibe ku jiyana ti kesî ne di bin mîsogeriyê de ye. Nexa-

sim kurdên ji bakurê Kurdistanê û yên ji rojhilatê Kurdistanê ew çend bi fikar in, nola çivîka li ser hej wanî dilerizin.

Fikarên di awiran de meyandî, fikarên xezaleke bêmedal e. Xezala di îklimê jiyana û mirinê de; ger xezal xwe li çem bixîne, çem ji tîmhehan bi mişt e; xwe li çolê bixîne jî çol tije dirrinde ye...

Penaberên welatê xwe

Gava min ev çavdêriyên xwe dinivîsand, pêşmergeyêkî ji rojhilatê Kurdistanê yê bi navê Behzad Mahmûdî yê li hemberî DAIŞ'ê şer kiribû. Lê paşê jî li kuçeyên Hewlêrê mabû bêxwedî û belengaz. Ew vê rewşa kambax hew debar dike. Lema jî Behzad Mahmûdî li pêş kamerayan, bedena xwe ya nazik dide li ber pêta êr û dawî li jiyana xwe anî. Niha jî çar heb ciwanên ji rojhilatê Kurdistanê, Jakan Baran Melekşahî, Ako Alah Muradî, Saadî Mahmûdî û Fardin Geramî lêvên xwe bi hev ve dirûtine û bi bêdengî diguhên kerr yên xemsaran de diqîrin. Pêlên desîbelên qîrîna bêdengyan, pêlên herî guhkerrîner e. Ev babet qîrîn ne bi guhan, bi wijdanan tîna bihîştin.

Guftugo pirr zêde bedewam nake. Lewra kes bi kesekî bawer nabin. Hesta bihevnebaweriyê, civatê di valahiyekê wer dike. Her wekî gotin bi meqesê were qutkirin, ji nişkan ve gotin ji devê wan tê birrîn. Nola kurkirkên şevê yên pêjîn bi ser wan bikeve, wanî kurrhildîçin.

Çavên min, bêyî min li ser civatê di-

gere. Dilê min ji min re dibêje "rejîmên ji edaletê dûr, mirov dixîne çî kirasî û çî dilqî ey xwedê!"

Bêdengiya mazûban

Mazûbanê min heta hingê ne ji çê ne ji jî xerab, qet nepeyivîbû û tev li mijarê nebûbû, dawiyê li bêdengiyê tîne. Îzna xwe ji civata hazir dixwaze û em radibin diçin mal. Bêdengmayîna mazûbanê min, bala min jî kişandibû. Lê ez sedemên wê yekê meraq jî nakim. Lewra tiştê zanîn, meraqê bi meriv re çênake û meriv nakeve tatûleya sedeman.

Di hewşa mazûbanê min de, du kûçikên bi qasî du şeran me pêşwazî dikin. Diyar e ku her du kûçikan jî gelekî kakûniya xwediyê xwe kiribûn. Xwediyê wan jî ne destvala bû. Tibabek hestî û pelaqê sorgoşt ji wan re anî bû. Mazûbanê min jî zilamekî bi dar û ber bû; bi qasî badîgartekî xurt bû. Dikarîbû bi humtukekê, gaboxeyek li erdê bixista û bikira şelte. Kûçikên wî jî xurt bûn. Mazûbanê min deriyê hewşê vedike. Ew kûçikên xwe, xwe diavêjin hev; hinekî bi hev re navê dilîzin û hevûdu vedigewixînin. Bi zimanekî xweser bi hev re dipeyivin. Di nava demeke kurt de, hevûdu di nava xwêdanê de kumêt dikin.

Mazûbanê min, hemû êlma xwe bera ser kûçikên xwe dabû. Kûçikên wî, paşmêr û dostên wî yên herî sadiq bûn. Mazûbanê min bi mirovan re kêr, lê-belê bi kûçikên xwe re pirr dipeyivî.

